

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

BIHAR/2008



37

*Newroza we pîroz,
paskalya we xweş û geş be!*

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/Ûç ayda bir çîkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 37, bihar 2008

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, I. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/lişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Belavkirin/Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya

Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dîşındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Silêman (Alexander Knutas)

*Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.
Ma fê redaksiyonê beye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li
xwedîyan nayên vegeandin.*

*Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almaniyayê piştgirên kovarê ne.*



Wêneya berga pêşî: „Newroz“, İllustrator: Bekir-Dan
Wêneya berga paşî: Gozela Şewo ji Qirpoliyê, 1950, Ji arşîva Dr. Mikailî



- 2 Newroza we pîroz be! – **Ali Ciftci**
- 4 “Mebûsên Kurd” – **Nebî Kesen**
- 6 Gelo kesekî ku malbata Silêman nas bike heye? – **Rohat Alakom**
- 8 “Ez di sala 1911an de li Kurdistanê... hatime dinê” – **Alexander Knutas**
- 13 Şaxê yekan di derheqê fermanrewayên Egîlê yên bi leqeba "Buldukan" tên naskirin de ye – **Jordan**
- 14 Şînên me li xeribîyê – **Altun Başaran**
- 16 Meyîte Stêrkan – **Cüneyt Dagdalan**
- 18 Tîrsa Tato – **Ecevit**
- 23 Fotera Huber – **Yusuf Yeşilöz**
- 26 NUH, Ji bo Nuh û gelê wî yê kurd – **Rafik Schami**, wergera **Nuh Ateş**
- 32 Heyfên Beqan II – **Uskî Cîmîk**
- 35 Hevpeyvînek bi Xizan Şîlan re – **Amed Tigrîs**
- 37 Werin ji min bipirsîn – **Xizan Şîlan**
- 39 Sitran – **Meme Xelîkan**
- 40 Xelika – **Seyfi Doğan**
- 41 Henek – **Mem Xelîkan**
- 42 Bağımsız Kosova'nın Düşündürdükleri!... – **İsmail Beşikçi**
- 49 İki Kitab “Tarih İçinde Haymana ve “Tarih İçinde Polatlı” – **Dr. Mikailî**
- 63 „Ve Kürtler, Aleviler, Çingeneler...” – **Mehmet Bayrak**
- 67 Ehmedê Xanî konusunda H. Mem İle Söyleşi
- 71 Di kurdî de formên neyînî – **Amed Tigrîs**



Newroza we pîroz be!

Ji destpêka sersalê vir de, li ser axa Kurdistanê bûyerên pir balkêş rûdan. Li ser rewşa kurdan û Kurdistanê di navbera dewletên dagirker de gelek hevdîtîtin çêbûn. Herçiqas ji raya giştî re rastiya van hevdîtînan nehatin aşkerekirin jî, di van rûdanan de, ji êrîşên mîlîtarîst ên Tirkîyê, Suriyê û Îranê jî hat xuyakirin ku hemû dek û dolabên wan ev e ku herketên kurd û daxwezên kurdan ên netewî, bên şikandin.

Lê, liberxwedan û hişyariya gelê kurd ew hemû dek û dolabên dewletên dagirker, hêzên nîjadperestên tirkan pûç kirin.

Di şayîyên Newroza îsal de, kurdan hevgirtin û piştgiriyeke xurt li her deverê Kurdistanê û herwiha li diasporayê jî nerazîbûna xwe li hember dewletên dagirker nîşan da.

Lêbelê dewletên dagirker, li hember vê serhildan û xwenîşandana kurdan bêtahamulîya xwe, bi êrîşan da xuyakirin: li başûrê biçûk, li bajarê Qamişloyê sê kes û li bakûrê welêt jî di êrîşên polisên dewleta tirkan de du geşîkê ketin û bi sedan însanên sîvîl jî, birîndar bûn! Îranê jî li devera Qendîlê û Qeledizê bi rojan bomberan kir, di hemên wextê de!

Di Newroza îsal de, careka din hat xuyakirin ku divê hemû siyasîmedar û kurdperwer, ne li dij hev, lê li gel hev ji bo yekîtiya kurdan kar bikin. Yekîtiya netewî îro ji do bêtir pêwîst e! Divê hemû alî, di vê meselê de serwest bibin ku îro xelkê kurd ji siyasîmedar û rêberên xwe tiştên ku dipê ev in: hevkarî, yekîti û piştgirî.

Dewleta Tirkîyê hewqes har bûye ku êdî berê xwe daye însanên sîvîl û xezan jî. Tenê ji ber ku kurd in û mafên xwe yê netewî bi rêyeke demokratîk diparêzin, têne girtin.

Xwendevanên birêz, di vê hejmarê de Nebî Kesen bi sernivîsa "*Mebûsên kurd*" siyaseta AKP-ê ya li ser kurdan şirove dike. Bêdengîya van "*Mebûsên kurd*" li hember bûyerên ku li Kurdistanê rûdîdin, rexne dike.

Rohat Alakom bi sernivîsa "*Gelo kesekî ku malbata Silêman nas bike heye?*" pîrsekê dike, rewşekê vedike ku trajedîya serûvena zarokê kurd di dema şerê yekem de çawa diherike û li kuderê disekine. Zarok bêkes dimîne û piştî serpêhatiyeka balkêş bi rêya malbateka Swêdî, di sala 1929an de tê li girava Gotlandê bi cih dibe. Rohat Alakom

hevpeyvîneka ku berê mirina Silêman (Alexander Knutas) rojnamevanekî Swêdê pê re kiribû, ji bo kovara me wergerandîye kurmancî. Hevpeyvîn di warê jiyana penaberîyê de gelekî balkêş e.

Altun Başaran wêneyekî bi navê "Şînên me li xerîbîyê" bi zar û zimanekî wusa xweş vedihûne ku bêguman di hest û ruhîyeta her penaberekî de xwe-diyê êş û xweşîyeke taybetî ye.

Yusuf Yeşiloz, Cuneyt Dagdalan, Ecewîd Yıldırım û Uskî Cîmîkî... heryek bi kurteçîrokek xwe weke şerabên ji kaseyên cuda cuda, lezeta vegotinên xwe yên edebî pêşkêşî xwendevanên Bîrnebûnê dikin.

Bi hevpeyvîna Amed Tîgrîs em bêtir şair û hozanê delal Xizan Şîlan nas dikin.

Dîsa em di vê hejmarê de rastî helbestên Seyfî Dogan, Mem Xelikan tîn.

Nivîsakerê Bîrnebûnê Jordan, li beşeke *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* kolaye û di dawiyê de bala me dikêşe ser gundê "Buldux"ê û dibêje: Ma ev "Buldux" a Anatolîya navîn ne ji leqeba wê eşîra *Fermanrewaya Egîla* wê demê be?

Û hêjayî gotinê ye ku em bibêjin, Nuh Ateş jî bi wergerandina kurteçîrokeke nivîskarê Sûrîyeyî, Rafîk Schamî rûpelên vê hejmarê dixemilîne. Di kurteçîroka xwe de nivîskar Rafîk Schamî, qedera zarokekî kurd vedihûne ku weke

hemû zarokên kurdan bi çi dijwarîyan dixwînin û mezin dibin.

Ku em vegerin ser nivîsên bi tirkî û bibêjin di vê hejmara me de çi heye:

Birêz Îsmail Beşikçi bi sernivîsa "*Bağımsız Kosova'nın Düşündürdükleri*" bi zimanê tirkî li ser serxwebûna Kosovayê û rewşa Kurdistanê radiweste û durûtîya dewletên Ewropayê, polîtîka ku li Tirkîyê li hember kurdan tê meşandin, rexne dike. Herwiha berpirsiyariya kurdan jî bi zimanekî xweş tîne rojevê.

Dr. Mîkailî, li du kitêban hûr bûye û bi zanyariya xwe destnîşan dike ku wan li ser eşîrên kurdên Anatolîyê çi çewtî kirine û çi enformasyonên çewt raxistine. Bi vê rexnenivîsa Dr. Mîkailî em bêtir ji rastîyên kurdên Anatolîya Navîn haydar dibin.

Û herweha nivîsakarê me yî hêja Mehmet Bayrak di vê hejmara me de dîsa bala xwendevanê xwe dikêşe ser mijareke balkêş û bi gotinên şair Enver Gökçe navekî li nivîsa xwe dike: "*Ve Kürtler, Aleviler, Çingeneler...*"

Ez dizanim min hinekî dirêj kir, lê ez kurt bibirim. Di vê hejmarê de ji hûn, ev hemû nivîskarên birêz û nivîsên wan... Lê bi destûra we dixwazim tişteki din bibêjim: heta hejmareke din Newroza we pîroz û paskalya we xweş û geş be!

Alî Çiftçi

“Mebûsên kurd”

Nebi Kesen

Mebûsên parlamentoyê yan ji partiyekê yan jî endamên serbixwe dibin. Ew, berê hîlbijartinan li gora hewldanên xwe yên siyasî, îdeolojîk û civakî eşkere dikin ku ew ji bo çî dixwazin bibin mebûs û berdevkîya çî û kê dikin. Helbijêr jî, gora nasnameya siyasî yên nazmetên parlamentoyê reya xwe didin wan û bi vê awayê demokrasîya berdevkî (temsîlî) pêk tê. Ji bona vê, nasnameya siyasî ya mebûsan û terciha helbijêran bi hevra girêdayî ne.

Li Tirkîyê, dawîya hîlbijartinên 22ê Tirmehê niqaş û kampanyayek li ser nasnameya mebûsên, ku li bajarên Kurdistanê hatine hîlbijartin, ji aliyê R. T. Erdogan û AKP-ê dest pê kir. Va babet ji aliyê nivîskarên medya, ku berê hîlbijartinan dijminatîyek mezin dijî Hikûmeta AKP-ê dom dikirin, jî kete rojevê. Dîtina AKP-ê û yên din ewe ku berdevkên kurdan “êdi” ne mebûsên DTPê ne. Gora wan, mebûsên AKP-ê yên kurd ji virha divê wek berdevkên kurdan bîn qebûl kirin. Di dema çû da Erdogan pir caran va îddia kiribû û îro jî berdewam dikê.

Pêwîst e ku hemû hêzên tevgera kurd sedem û armancên stratejîya AKP-ê baş teqîp û fam bikin. Di tarîxa kurdan da hinek caran “stratejîyek” wisa hat pêkanîn û îro jî bi destê AKP-ê ket rojevê. Belê,

Erdogan û partiya wê bi “nasnameya kurd” ya hinek mebûsan çî dixwaz in yan jî kîjan pîlanan didomînin? Divê, bersîva vê ji aliyê çend aspekthan bê dayîn.

Dewleta tirk, bi şiklê resmî, hîn jî ne kurdan wek gelekê serbixwe, ne jî berdevkên wan wek muhatab qebûl nake. AKP hebûna kurdan wek „hemwelatên Tirkîyê yên sinifa yekemîn“ têne ziman, lê ji aliyê mafên netewî û temsîlkirin siyaseta dewletê berdewam dike. Ji bona vê Erdogan û medya tirk, dawîya hîlbijartinê dest bi argûmana nû kirin. Ew dibêjin ku, kurd li Tirkîyê xwedî mafên hemû hemwelatî ne û DTP ne berdevkê kurda ye. Gora dîtina wan, kurdan terciha xwe ji aliyê AKP-ê kirin û „mebûsen xwe“ bi navê AKPê şandin meclîsa Tirkîyê. Bi vî awayî, him kurd wek netew yan jî gel û wek hêz tîn înkarkirin, him jî tesîrek li ser raya giştî ya navnetewî tê pêkanîn. Li derveyê welat propagandaya dijî PKK, DTP û hêzên kurd yên din bi navê „mebûsên kurd yên AKP“ dikeve merhaleyek nû.

Wek tê zanîn, partiya legal ya kurd herî mezin DTP-ê ye. Berî û dema hîlbijartinan 22ê Tirmehê, ji aliyê hêzên dewletê û ordiyê pir astengî li hember DTP hatin derxistin. Dîsa jî gelek kurdan li bajarên Kurdistan û Tirkîyê raya xwe dan DTP-ê. Nakokiyên nav kemalîstan, ku serê wan er-

kanê artêşa Tirkîyê dişand, û AKP û kûrbu-
na şerê çekdarî bûn sebeb ku, li pir bajarên
Kurdistan gelê kurd raya xwe da AKP-ê. Va
tercîha kurdan bi hêviya çareserkirina pirs-
girêka kurd ra girêdayî bû. Lê AKP xwedî
li gotinên xwe derneket û bi tezkereya me-
clîsê rîya şerekê li Başûra Kurdisanê vekir.
Daxwaz û guhdariyên kurdan jî AKP-ê vala
derketin. Sala 2009an da hilbijartinên herê-
man hene. Erdogan û partîya wê dixwazin
ku carek din raya kurdan bigrin û DTP-ê
pûç bikin. Ji bona vê jî, argûmana „mebûsên
kurd yên AKP-ê berdevkên kurda ne“ xiz-
meta amadebûna hilbijartinên pêş dike.

Îro ne tenê li Kurdistan, li hemû
Tirkîyê û dinê niqaşa pirsgirêka kurd di-
be. Hikûmeta AKP-ê û hêzên dewletên
yên din, vê pêvajoyî baş tizanin û di nav vê
niqaşê da ne. Operasyonên li Kurdistana
Başûr carek din da berçav ku, kurd êdî dest
ji doza xwe bernadin û siyaseta Tirkîyê ya
asîmilasyon, înkâr û kedxwarî qebl nakin.
Partîyên wek CHP-ê û MHP-ê, ku nasna-
meya kurd naxwazin bibînin yan jî qet qe-
bul nakin, ji vir ha nikarin raya kurdan
bigrin. Tenê AKP-ê cûdatîyên xwe bi navê
„biratîya olî“ yan jî „omata musliman“ ji
nav kurdan da eşkere kir û alîkarîya hilbi-
jêrin kurd dest xist. Mebûsên AKP-ê, ku
eslê wan kurde û li bajarên Kurdistan hatin
hilbijartin, tenê di xizmeta armanca AKP-ê
û siyaseta dewletê ya înkarkirinê da ne.

Xeter û sûcên „mebûsên AKP-ê yên
kurd“ gelek pir in. Wexta gelek hêzên de-
mokrat û lîberal yên tirk alîkarî daxwazên
kurdan dikin, va mebûsên jî Kurdistanê

hin jî bêdengin. Qet yek kes ji wan mebû-
san dijî operasyonên li Başûrê Kurdistanê
rexneyên xwe nekir. Ji bo çareserkirina
pirsgirêka kurd, heta îro tû pêşniyar û pro-
je ji aliyê „mebûsên kurd yên AKP-ê“ ne-
hatin bihîstin. Pirsek ewe ku, van mebûsan
ji bo çî raya gelê xwe xwestin û ketin parla-
mentoyê? Ew kîjan problemên hilbijêrên
xwe, ku ji sed sed kurd in, dixwazin bînin
rojewa meclîsa Tirkîyê? Şexsiyet, rêxistin û
dewletên Ewropa roj bi roj daxwaza dayîna
mafên kurdan jî Tirkîyê dikin, va „mebûsên
kurd“ ma ji kîjan netewî ne? „Mebûsên
kurd yên AKP-ê“ lal in û yan jî li heyvê di-
jîn? Dilê van mebûsên, ne tenê bi kuştina
eskeran, bi kuştina gerîlayan û gundîyên li
Bakûr û Başûrê jî naşewite?

Wezîfeya pêşî yên van mebûsên AKP-ê
divê ew be ku, menfatên gelê xwe biparê-
zin û zorê bidin hikûmet û partîya AKP-ê.
Erdogan sala 2006an çûbû Amedê û so-
za çareserkirina pirsgirêka kurd da. Lê îro,
Erdogan bûye berdevkê şerê dijî kurdan û
divê va „rastîya AKP-ê“ ji aliyê mebûsên
kurd yên vê partîyê bê şermezarkirin. Eger
mebûsên wî karî nikarin bikin, divê nebêjin
ku, ew kurd in û bi navê kurdan çûne me-
clîsê. Ev gotin ne durustî ye û divê wek de-
rew bê famkirin. Helwesta niha ya „me-
bûsên kurd yên AKP-ê“ di lîteratura dinê
da wek îxanetî ya welat û gelê xwe tê tarîf
kirin. Di tarîxa kurdan da nimûneyên vê
helwestê gelek hene û divê ew mebûs tarîxa
me carek din bixwînin û encaman ji bo xwe
derxin.

Gelo kesekî ku malbata Silêman nas bike heye?

Rohat Alakom
ralakom@yahoo.com



Silêman (Alexander Knutas)
Ev sûret di sala 1929an de, dema Silêman koçberî Swêdê kiriye hatiye kişandin

Dema min berî çend salan pêwendiyên kurd û swêdiyan lêdikoland, ez rastî serpêhatiya Silêman hatim. Navê wî di çavkaniyên swêdî de wek Alexander Knutas derbas dibe. Çawa em ê li jêr jî bibînin serpêhatiya wî gelek dûr û dirêj û ewqas jî rengîn û balkêş e. Angorî îfadeya Silêman ku li jêr e, ew di sala 1918an de bi derketina şer, di salên rev û bezê de tev malbata

xwe ji gundê xwe reviyane û careke din ve negeriyane cî-meskenê xwe. Silêman di vê revê de dê û bavê xwe û birayekî xwe winda dike. Silêman û birayê wî Sala êdî sêwî dimînin. Paşê hêdî hêdî tên bajarê Tiflisê, li wir parsektiyê dikin. Almanek li Silêman xweyî derdikeve û wî dibe gundekî alman bi navê Klosterdorf Ukraniya ye, li Rusyayê hebû. Angorî îfadeya Silêman

birayê wî salan bi tena serê xwe li Tiffîsê dimîne, çî hatiye serî wî ew jî nizane. Paşê çawa dibe Silêman diçe gundekî swêdiyan li Rûsyayê bi navê Gammalsvenskby, li wir di sala 1922an de malbateke swêdî vî zarokê kurd ji xwe re dike ewled. Dema ev malbata swêdî di sala 1929an de vedi-gere Swêdê, Silêman jî bi xwe re tînin. Silêman heta sala 1981an li Swêdê dimîne û li wir wefat dike. Angorî îfadeya Silêman ew di sala 1911an de ji dayîk bûye. Dema hatiye Swêdê, polêsê rûs di pasaport û vîzeyaya wî de wek cihê rojbûyînê tenê bi rûsî “Kurdîstan” (Курдистан) nivîsiye.

Berî ku Silêman wefat bike du rojneme-vanên swêdî bi wî re hevpeyvînekê çêdikin û sûretên wî diweşînin. Li jêr em hemû gotinên Silêman belav dikin. Em dibêjin hevpeyvîn, li jêr hûn ê jî bibînin Silêman tenê bersîvek daye, lê belê bersîveke dirêj, tam, rêkûpêk û bi keder, bi êş û bi jan. Wî di carekê de hemû serpêhatiya xwe gotiye û hundurê xwe velo kiriye. Wî di destpêka vê hevpeyvînê de ji rojnemevanan re: “*Eger ez hemû tiştî di derbarê jîyana xwe de bêjim wê bibe romaneke mezin*” gotiye.¹ Silêman li Swêdê di selexaneyekê (qesabxane) de kar kiriye û paşê teqawit bûye, salên xwe yên dawîn di xaniyekî bi yek ode de derbas kiriye û tu wext jî nezewiciye.

Dem a ku mirov salên reva (1918) malbata Silêman û hatina wî ya bajarê Tiffîsê bi reva kurdên êzîdî li derdorê Qersê dide ber

hev, mirov bi bawerîyêke mezin texmîn dike ku malbata Silêman yan jî Silêman bi xwe yek ji wan kurdên êzîdî ye ku di sala 1918an de ji Qersê derketine hatine Rûsyayê. Di van salan de dema ku leşkerên osmanî dikevîne bajarê Qersê, tenê kurdên êzîdî ji ber zilm û zordestiyê ji cihê xwe leqiyane û ketine rêyan. Çawa tê zanîn di van salan de li devera Qersê li derdorê Dîgorê çend gundên kurdên êzîdî hebûn. Serpêhatiya Silêman û serpêhatiya kurdên êzîdî ji gelek aliyên ve dişibîne hev, formatên van serpêhatiyan yekreng in. Di navbera herdu serpêhatiyan de gelek xalên dem, cih û tehrê koçkirinê yê hevbeş hene.

Dem a Silêman di sala 1918an de hatiye Tiffîsê zarokekî piçûk 7-8 salî bûye. Navê gundê xwe, navên birayên xwe jî tam nizane, ihtîmaleke gelek mezin e ev nav jî bîr kiriye yan jî bi tehrekî din bi bîr tîne. Di sala ku ev hevpeyvîn wek pirtûk hatiye weşandin ango di sala 1981an de, di eynî salê de jî Silêman li Swêdê wefat kiriye, li pey xwe ji me re jîyaneke ser qaxizê, ev hevpeyvîna li jêr hiştiye. Gelo Silêman ji kurdên êzîdî û ji devera Qersê ye? Em vê gavê sedî sed tişteki nikarin bêjin, piştî ku xwendevanan serpêhatiya wî ya li jêr û bi devê wî xwendin, em ê mêze bikin ka ew çî difikirin? Her çiqas gelek sal derbas bûne jî bersîva vê pirsê dikare zelal bibe û em ê Silêman jî nêzîk ve nas bikin. Eger em bawerîya xwe bi gotinên Silêman yê li jêr bînin û heta cîhekî divê em bînin jî, wê çaxê kesên ku navê wî û navê birayê wî

¹ Anders Rundvall & Bertäl Hagert, *Svenskarna från Ukraina*, 1981.


Sala, serpêhatiya dê û bavê wî bihîstibin îro di nav kal û pîrên li Tiffîsê û Erîvanê dijîn mimkûn e hebin! Niha bi saya înternetê mirov dikare gelek zû, bi lez bi mirovên çar nîklên cîhanê re têkiliyan dayne. Piştî vê nivîsê ji xwendevanên Rûsyayê, ji kurdên Rûsyayê tika û daxwaz dikim eger kesek

rastî agahî û zaniyarîyekê hat, bila bi kerema xwe bi min re têkiliyan dayne. Ez ê gelek dilşa, kêfxweş bibim. Adrêsa min:

ralakom @ yahoo.com

Belê, niha emê mêze bikin ka hûn ê ji van gotinên Silêman çi fam bikin!

“Ez di sala 1911an de li Kurdistanê... hatime dinê”



Ev sûretê Silêman di sala 1981an de hatiye kişandin, sala ku wefat kiriye û ev hevpeyvîn pêra hatiye kirin

“Ez di sala 1911an de li Kurdistanê li cîhekî gundê bi navê Tonstra hatime dinê. Li cîhekî dibêjim ji ber ku ez nizanîm ew li kiderê ye. Belkî qet niha tune be jî. Ji bo ku gundê cîhbûyîna xwe fêr bibim min him li bal berpîrsiyaran û him ji rêxistinên taybetî alîkarî xwest. Lê belê tu kes bi serneket. Ev yeka ji bo

birayê min jî derbas dibe. Heta niha gelo ew dijî û eger dijî li kiderê ye? Ez nizanîm.

Em li welêt li gundê Tonstrayê sê bira bûn. Hemû kur bûn. Navê birayê min ê mezin Sala bû û navê min bi xwe Silêman. Birayê piçûk navê wî Torsten bû. Ez nizanîm çima dê û bavê min ev nav li wî kiribûn.

Di sala 1918an de hemû kurdên Tonstrayê ji me hemûyan şermoktir bû. Lê belê ez nizanim. Belkî jî tenê şermayeti nîn bû. Ez bawer dikim ku mirina dê û bavên ew di nav reweşke zorê de hiştibû. Ew wiha wek apatîkan bêhêz ketibû. Ez bi xwe tu wext neditirsîyam. Niha ji her demê zêdetir divê em xwe bidin hev eger em şanseki jîyîne bi dest bixin.

Di sala 1918an de hemû kurdên Tonstrayê ji me hemûyan şermoktir bû. Lê belê ez nizanim. Belkî jî tenê şermayeti nîn bû. Ez bawer dikim ku mirina dê û bavên ew di nav reweşke zorê de hiştibû. Ew wiha wek apatîkan bêhêz ketibû. Ez bi xwe tu wext neditirsîyam. Niha ji her demê zêdetir divê em xwe bidin hev eger em şanseki jîyîne bi dest bixin.

Me parseki dikir û em derketibûne seferke bêdawî. Me berê xwe da jorê, em çûn Qafkasyayê. Dema bavê me mir, edî ji me re zêde destûra mayîne li wê çiftligê nema û hêdî hêdî em hatin Tiflîsê li Gurcistanê. Bajar li ser berpalekê bû ku li aliyê Behra Reş dima û li kêleka qiraxê behrê rîya hesin dirêj dibû. Lê belê em neçûne hundirê bajêr. Bajar ewqas mezin bû, em li derdorê bajêr man. Her çiqas ez 6-7 salî bûm jî, min him li xwe û him jî li Sala mêze dikir. Ji bo em tişteki bixwin, min nedihîşt Sala here derva parsekiyê bike. Tê bîra min çawa em şevan di bin seleki (zinar) mezin de diman ku him li dijî baranê û him jî li hemberî sermê em diparastin. Lê wir kesî nikaribû em biditana jî. Wek tê zanîn di rewşa me de gelek kes hebûn. Li kêleka rê û dirban tijî parsek bûn. Carina jî tiştên hev didizîn. Dema ez li hundirê bajêr bûm, Sala di bin zinêr de bû. Hemû rojan ew li wir veşartî dima.

Me sefera xwe berdewam kir. Li dorberê me şer giran dibû. Li vir jêrê dijmin hemberî hev sekinîbûn. Dema em hatin nav sînorenê Azerbeycanê perçekî bêdengî çêbû. Bavo şivan bû û li çiftligekê ji xwe re cîhek dît. Me ji xwe re kiribû edet ez û Sala li derva bi bavê xwe re digeriyan.

Rojekê bavo xwe baş his nedikir û li malê ma. Hemû rojê ez û Sala li derva bi pêz re bûn. Dema em êvarê vegeyriyane çiftligê, ahaliyê gund gote me ku ez û Sala niha bi temamî tenê mane! Niha bav jî miriye. Me çarşeveke spî lê aland û li gelek nêzîki me, di çelege mezin de veşart.

Niha em li dinyayê bi tek-tenê ne. Ez û Sala. Her çiqas Sala çend sal mezintir be

Me parseki dikir û em derketibûne seferke bêdawî. Me berê xwe da jorê, em çûn Qafkasyayê. Dema bavê me mir, edî ji me re zêde destûra mayîne li wê çiftligê nema û hêdî hêdî em hatin Tiflîsê li Gurcistanê. Bajar li ser berpalekê bû ku li aliyê Behra Reş dima û li kêleka qiraxê behrê rîya hesin dirêj dibû. Lê belê em neçûne hundirê bajêr. Bajar ewqas mezin bû, em li derdorê bajêr man. Her çiqas ez 6-7 salî bûm jî, min him li xwe û him jî li Sala mêze dikir. Ji bo em tişteki bixwin, min nedihîşt Sala here derva parsekiyê bike. Tê bîra min çawa em şevan di bin seleki (zinar) mezin de diman ku him li dijî baranê û him jî li hemberî sermê em diparastin. Lê wir kesî nikaribû em biditana jî. Wek tê zanîn di rewşa me de gelek kes hebûn. Li kêleka rê û dirban tijî parsek bûn. Carina jî tiştên hev didizîn. Dema ez li hundirê bajêr bûm, Sala di bin zinêr de bû. Hemû rojan ew li wir veşartî dima.

Li hundirê Tiflîsê mirov dikaribû rastî gelek leşker û zabitan bihata. Cephe li başûra bajêr hatibû vekirin û bi vê rêyê timê yekîneyên leşkerî dihatin û diçûn. Kesên birîndar ji cephê dianîne Tiflîsê û tren li pey trenan çek-silah û hewcedarî bar dikirin bajêr. Di vê tevliheviyê de dema leşkeran

Li hundirê Tiflîsê mirov dikaribû rastî gelek leşker û zabitan bihata. Cephe li başûra bajêr hatibû vekirin û bi vê rêyê timê yekîneyên leşkerî dihatin û diçûn. Kesên birîndar ji cephê dianîne Tiflîsê û tren li pey trenan çek-silah û hewcedarî bar dikirin bajêr. Di vê tevliheviyê de dema leşkeran

didîtin ku zarokek bi dirêjahiya kuçan li pey parîyek nan ketibû, gunehê wan pê dihat. Ji bo ku zêdetir xwarinê peyda bikim ez di nav demeke kurt de hîn bûm ku ez ê herim kîderê.

Cîhekî wiha aşxaneyek bû ku almanekî îdare dikir. Wî bi taybetî ji min hez dikir. Min timê gelek xwarin ji wî digirt û him jî dibire malê ji bo Sala. Min almanî nizanibû, tenê kurdî zanibû. Lê belê çawa dibe bila bibe em bi ser ketibûn û me bi rêyekê hevdu fam dikir. Di destpêkê de min gelekî ji wî hez dikir.

Ji min re eşkere xuya kir ku ew ji dereke Ukraniyê tê û di nav demeke kurt de ew ê terhîs be, here welatê xwe. Wî bi vekirî got min wekî li min xweyî derkeve. Lê belê tenê ez. Di eynî wextî de yekî din wê li Sala xweyî derketa. Tu wext ez fêr nebûm ku ew kî bû. Ne hate aqilê min ku ez bipirsim jî.

Ne ez û ne jî Sala sedemek tune bû ku em li dijî vî biryarî derkevin. Em wê demê ne fikirîn ku em ê ji hev dûr bikevin û herine cîhine gelek ji hev cuda. Jîyan ji bo van herdu zarokên nekemilî bi zehmet bû. Eger me ev şansê ku hatibû ber deriyê me, şunda vegeranda, me nikaribû ji nav vê rewşa bi tirs canê xwe bi emîn xelas bikira.

Ez roja çûyîné tu wext ji bîra xwe dernaxim. Ez li hundirê Tiflîsê, li aşxana leşkerî bûm. Ji nêşkêva ambulansê hat. Şofor ji hundir derket û ji min pirsî ku ew li kîderê dikare birayê min bibîne. Cîhê ku me ji xwe re kiribû edet û xwe lê vedişart, min jê re vegot. Wisa ez jî bi ambulansê pêre çûm, min rê nîşan dayê. Sala wek hertim di bin wî zinarê

mezin de bû. Di hundirê ambulansê de du kes hebûn. Wan dan pêşiyê û Sala derxistin derva, ew birin serê wî xweş şûştin û kincên din lêkirin. Tiştê ku tenê min di dawiyê de dît wan herdu kesan çawa birayê min xistine hundirê ambulansê.

Rastî wiha bû, ew xwarinçêkirê alman ku li min xweyî derket, ji gundê Klosterdorfê bû, ev gundê alman bi temamî li bakûra gundê Gammalsvenskby dima. Lê belê eşkere ye ku min nizanibû ne ev gunda, ne jî yê din li kîderê ye û ez nefikirîm ku ev çivanek û kontaktên bi gundê Gammalsvenskby di jîyana min de wê bê çî maneyê. Lê belê niha em ê herin Klosterdorfê. Di jîyana xwe de ev cara pêşîn e ku ez trenê şîyar dibim û ev yeka di jîyana min de wê bibe macerayeke mezin. Gera me ji Tiflîsê, ji nav Qafkasyayê û ji Ukraniya Mezin heta wî gundê li nêzîkê çemê Dîneperê du rojan ajot.

Çawa em hatin Klosterdorfê wî almanî tevgerên xwe li hemberî min guhartin. Paşê ez fikirîm gelo şexsîyeta min yan tehrê rabûn û rûniştina min hêrsa wî anîye, wek mîsal kêmasiyên min ên zimanê almanî. Hemû tiştên wî digot min fam nedikir, vê yekê hêrsa wî dianî. Malbata wî gelek mezin bû, heft keçik û kurek. Kur ji ber kotek û lêdanan mir. Paşê wî berdeham kir zora xwe ji min derdixist.

Wê demê welîtî tune bû. Zarokekî bêdê û bêbav tenê dikaribû hêvî bikira ku têkeve ber destên dê û bavên gelek qenc, zarok ne tenê wek berdestî, xulam wek endamekî malbatê bihata dîtin. Lê belê tevgera alman li hemberî min tu wext nehate guhartin. Wî her li min dexist heta dema ez li çiftligê

mam. Tu kes, her çiqas bi çavên xwe didîtin jî nediketî navberê. Ji ber tirsê yan jî tenê difikirîn ku têkiliya wan bi vî tiştî tuneye.

Bi taybetî havînek tê bîra min. Gelek, gelek germ bû. Ez nizanim ji ber çi bû ev hemû. Alman ji nêşkêva hate ser min, bi jopan êrişî min kir. Hertim li serê min dexist. Tenê bû birîneke mezin. Tu kesî baş li birînên min mêze nekir û di dawiyê de gelek kurm di birînên min de peyda bûn. Wê demê min ji çiftligê firar kir, reviyam. Lê belê zêde nikaribû. Ez revîm derva û min xwe di nav zevîyeke çavdar de veşart. Ez li wir ji ber germê ji xwe ve çûme, dema ku hişyar bûm gelek mirov ji çiftligê li dora min berev bûne. Alman jî li wir bû. Pêra kulmek av û cimbizek hebû. Wisa wî dest pê kir ew kurm ji birînên min berev kirin. Demeke dirêj girt berî ku birînên min biceribin û ez vê yekê heta îro jî hîs dikim.

Hêdî hêdî ez fêr bûm ku alman jî tevî dizîyên cuda cuda bûye. Ne tenê bi serê xwe. Ew yek ji wê cerdê bû ku ji xwe re kiribû edet ji gundên wan dorberan di vê navberê de ga didizîtin. Dema min bîryara xwe da ku dev ji çiftligê berdim û ji lédanan xelas bibim, min wisa jî bîryar girt ku wî wek tohildanekê îhbar bikim ji bo wan hemû tiştên ku hatine serê min.

Payîza sala 1921an sar bû û Çemê Dîneperê bûz girtibû. Wisa bi hêz bû ku mirov dikaribû li ser bimeşe heta wê girava derî gund. Li giravê hin gundiyan ji xwe re kiribûne edet hespên xwe serbest berdidan, hesp dibezîyan. Li wir hespên wî almanî jî hebûn. Rojekê wî hefsarek da min ku biçim

giravê û ji wî re hespekî bînim. Bawer bike-neke wî ez pêxas şandime wir.

Helbet ez çûm. Tiştêkî din min nikaribû cesaret bikira. Lê belê di nivê rê da ez rastî du rûsan hatim û em bi hevra peyivîn. Wan ji min pirsîn wekî gelo min çend ga ditine ku berî niha di rê de dihatin ajotin. Min têra xwe rûsî zanibû ku her tiştî niha eşkere bikim. Ez wê demê di derbarê alman de bi herdu rûsan re peyivîm û çî dewarê alman li çiftligê hebû min ji wan re got. Herdu rûsan dûrikê xwe yê xwarinê jî bi xwe re anîbûn. Dema em dipeyivîn wan nan û goştê bi don yê berezan îkramî min dikirin.

Min alman da dest. Ez tu wext ji vê yekê poşman nebûm. Wî paşê ji ber vê, cezayê xwe kişand. Ez pêxas bûm û ji ber sermayê di rê de dilerizîm. Di rewşeke wiha de tiştêkî min li wir nemabû ku edî ez careke din vegeryama. Almanê ez bigirtama û heta kuştinê ez bidama ber lédanan.

Min hefsar avêt û li ser bûzê reviyam. Berî ku ez derbasî aliyê din bibim dorber bûbû tarî. Navê gundê ku cara pêşîn ez lê rast hatim, Kajir bû. Gundekî rûsan bû. Jin û mérékî dilovan hiştin ku ez şev li wir bimînim. Xwarin û cîhekê germ ku ez lê razême dane min.

Ji Kajirê çend kilomêtir dûr gundekî rûsan hebû ku navê wî Naikron bû. Li vî gundî xwişkeke alman hebû. Dema ez cara pêşîn hatime Klosterdorfê nav jî li min kirin. Wê demê vê xwişkê alikariya min kir. Tê bîra min ku min ji wê gelek hez kiribû. Ji ber vê yekê gelek tebû bû ku min berê xwe da wir. Wê û malbata wê ez bi dostane qebûl kirim

û ez çend heftan li bal wan mam.

Lê belê di nav demeke kurt de ez careke din li Klosterdorfê bûm. Çibekî ez biçûmayê tunebû. Dîsa ez ketim rîyan ji bo ku parsekiya hinek xwarin bikim. Bi vî tehrî ez hatim gundê Gammalsvenskby û li wir jineke xerîbdost demekê li min xweyî derket.

Salên 1920-1921an wisa jî ji bo Gammalsvenskby salên dijwar bûn. Ne tenê encamên şer û şoreşan hebûn ku şopîz hiştibûn. Ser van de wisa jî bêavî û kêmbişnayê hebû ku birçibûn û xela bi xwe re anîbû. Xaça Sor ya Swêdê alîkarîyek şandibû û tê bîra min ku min jî para xwe jê girtibû. Berî her tiştî bi taybetî kumekî sor tê bîra min.

Karmendên Xaça Sor jî virda-wêda li gund digeriyan û ji xelkê dipirsîn gelo kes heye ku bifikire li min xweyî derkeve. Malbateke ku tenê keçeke wan hebû xwest ku min têxin zarokê xwe. Bi resmî ev yeka di roja 3/1 1922an de qewimî.

Sê sal tune bûn ez li bal nîv-dêbavên xwe mam. Rojekê zirbavê min, ji kar, ji zeviyê hat û gote min: "Heta niha min tu mezin kirî û ji niha pêva divê tu çareya serê xwe binêrî". Ji ber vê min tiştên xwe yên hûr be-
rev kirin û dev ji gund berda.

Ez deh kîlometre çûm û ez hatime gundekî rûsan yê bi navê Novoraïsk. Li wir bal gundîyekî rûsan bûme berdestî, xulam. Li wê çiftlikê du sala mam. Kêfa min li wir dihat û ew jin û mêrê gundî li hemberî min baş bûn. Wî almanî li gelek nêzîk erd kirê kiribû, dema min li wir kar dikir wisa vê jin û vî mêrî gelek caran ez dîtibûm.

Ez hê zarokê wê malbata Gammalsvenskby bûm. Di sala 1929an de dûre gazî min jî kirin ku herim gund, tevî wê komê bibim ya ku amade ye ji wir bar bike û here Swêdê.

Êvarekê dema şîvê, wî gundiyê ev babeta ji min re vekir û gote min: "Ez fam dikim tu bi hevalên xwe re tevayî dixwazî herî. Eger du dixwazî li bal me bimînî, du dikarî bimînî. Me çi xwariye, tu ê jî wî bixwî. Lê belê di derbarê vê yekê de ez naxwazim şîretan li te bikim". Ev dostayetiyeke rast bû ku di wê demê de ji min re dihate nîşandayîn. Lê belê min biryara xwe girtibû. Min dixwast bi yên mayîn re herim Swêdê.

Bi vî tehrî rêyên me ji hev cuda bûn.

Min hewl da dîsa jî tiştên tîrş û tal ku hatine serê min ji bîr bikim. Min bawer dikir ku rehetî û emnîyeta ku ez li hesreta wê bûm, belkî jî welatê Swêdê wê şunda bide min. Lê belê mirov tu wext ji koka xwe nikare biqete û vê yekê li Swêdê ez gelek caran eşandim. Ya here tîrş û tal ew bû ku gundiyên swêdî tu wext ez qebûl nekirim. Belkî jî ev yeka ye ku jibîrkirina serboriyên zaroktiyê dijwar dîke".²

² Anders Rundvall & Bertäl Hagert, *Svenskarna från Ukraina, Weşanxaneya Harriers*, 1981.

ŞAXÊ YEKAN

DI DERHEQÊ FERMANREWAYÊN EGILÊ YÊN BI LEQEBA "BULDUKANI" TÊN NASKIRIN DE YE

Jordan

Nivîskarê van rûpelan, gelek car ji kesên bi bawer seh kiriye ku sebebê bi van hukumdaran ve pêvekirina leqeba "Buldukani" ev e: *Dema ku Pîr Bedir ji ber Selçûkiyan bantz da û rizgar bû, çû Meyfarqînê û xwe avêt bin desthilata Emîr Husameddin. Heta di şerê îstîlaya kela Meyfarqînê ya ji aliyê fermanderê Sultan Alp Arslanê Selçûkî Emîr Artuk jî li wir xwe veşarti jiya. Alp Arslanê Selçûkî, walîtiya Mêrdîn û Arnedê dabû destê Emîr Artuk û nîfuza zarokên wi heta Heleb û Bexdayê jî belav bûbû. Ji ber vê, diroknanan ew kirine nav sultanên şaxên ji Împaratoriya Selçûkiyan. Hejmara sultanên ji vê şaxê tên, heft in; dawînkê jî wan, ew Sultanê navê wi Melik Nasireddîn e. Ew, hê di destpêka Dewleta Akkoyuniyan de ji aliyê Hesên Begê Bayindirî ve hat kuştin û bi mirina wî jî dawî li Dewleta Artukî hat.*

Yani bi kurtî, Emîr Artuk, fermana muhasereya Kela Meyfarqînê girt; dest bicîkirina vê emrê han kir û muhasereya ser wan kesên berevani (xweparastin) li xwe dikirin, teng kir.

Di vê navê ra, tîreke eskerên Emîr Artuk, îsabetê Emîr Husameddin kir û ew kuşt. Vê bûyerê qudumê dest û piyê kesên di bin muhasereyê da sist kir. Di nav wan de bêserûberî û sistiyê dest pê kir; hêz û taqeta wan ji bo berdewamkirina xweparastinê û sebata berxwedanê nema. Li ser ve Emîr Artuk şevêkê ji fîrsetê îstifade



kir û ji hemû milan ve êrişeke tund û giran bir ser keleyê û bi zorî ketin hundur. Belê, Pîr Bedir ji di vî şerî da şehîd ket. Bi vî awayî kesek ji Fermanrewayên Egilê nema. Lê tenê jina Pîr Bedirê wê çaxê hamîle bû. Êdî hemû hêvî bi wê hat girêdan û çavên Mirdasiyan tev li cinsiyeta zarokê dê bibûya bû. Herroj rîsipî û giregirên Mirdasiyan dihatin ber derê xaniyê wê jinika han û xebera hemildanina wê jê dipirsîyan û wiha digotin: "Xwedayê mezin dê zarokek çawan îhsanê me bike; kur e an keç e?" Rojek ji wan rojan bû ku cardin xelk wekî hemû wextê li ber xani berhev bûbûn. Tam wê navê re mirovek ji xanî derket. Ji wan re bi tirkî û bi îşareta ku hê pêşî da di nav xwe de tespît kiribûn wiha got: "Çok şükür Hudaya ki istediğimizi bulduk". Li ser vê, navê vî kurê esil bû "Emîr Bulduk" û pişt ra jî nav û leqeba Fermanrewayên Egilê bû "Buldukani".

Şerefname, weşanên APEC.

Wergera kurmançî: Ziya Avcı, rupel: 213-214.

Gelo li Anatolîya navîn gundek bi navê «BULDUK KÖYÜ» heye.

Ma vana ji êşîra Mirdasiyan nebin?

ŞÎNÊN ME LI XERÎBÎYÊ

Altun Başaran

Rojek ji rojên havînê, bi ronahî û germ ez hatim Swêdê, xerîbîyê. Jiyaneke nû bi zimanekî xerîb, kultureka xerîb û li welatekî xerîb dest pê kir. Min xwe bi tenê didît. Rojekê li ber dêrî, pîreka bi kitana sipî dawastîbû, li kêleka wê bûkeka ciwan bi du zarên biçûk va xwe dabûn ber dîwêr. Min got, ji ku heve ev ji me ne. Ez çûm ba wan. Mina kûçikî ku xwadiyê xwe diye, min lê pirsî. Pîreka kinik a sipî û bi rûken bû. Min ji wan pirsî wun ji ku ne? Gotin: em ê bilkî ne, ji gundê Qereomera. Min qet tu cara navê wî gundî nebîstîbû. Ji bo min kurdbûna wan bes bû!.. Min ew vekî dîya xwe dît. Wê jî weke keçîka xwe ji min hez kir.

Li îdekê, arefekê derîyekî ji me ra ji vebû. Êdî ji bo me bû edet ku li îda em ê biçûna mala xaltiya El, me destê wê maçdikir û ew edeta, li xerîbîyê bi me bîrkinin nedida!..

Xwarina wê pir xweş bû. Bi taybetî Beqlêwê wê pir xweş bû. Mala wê ava be, em bi tenê nedihîştin li xerîbîyê... Li pişt çend salan min diya xwe anî Swêdê. Ew bi hev ra bûn heval, wekî du xwengan.

Min ji kal û pîra û kurikan pir hez dikir. Rojekê min ji wan ra şênawîyek çêkir. Min hevalên wan davet kirin.

Ê ku hatin giştik pîr bûn. Bi hev ra xwarina xwe û derdên xwe par kirin. Wekî ku min ew birin gundên wan, bahsa jiyana xwe ya wir kirin. Xem û xeyalên wan riviyan.

Min ji wan pirsî ka ew xwe li vir, li xerîbîyê çing dibînine. Wana jî got: *em xwe li vêderê mîna kurikên berdestkî dibînîni. Ji bo ku me mal û meydana xwe ji xwe bişiva hişt û em li vê derê vekî mêvana dibînîne.*

Jiyana xaltiya El û ya dîya min wekî hev bû!.. Hurd jî vê bira bûn. Mala bavên wan mîrat bû. Mêrên wan li ser wan zevicîn. Ew ê bi hewî bûn. Heryekê xwuçekêka xwe hebû. Jiyana wan bi zexmet bû. Lê kurkên wan pir jê ra bi xêr bûn. Xêrak wan dîtî, kurkên wan bûn. Keserên wan kûr û bûkên wana pir baş bûn. Jê pir razî bûn!.. Hurd jî kinik û rûken bûn. Porên xwe yên sipî bi henê sor dikirin. Ji xwe xweş bûn.

Dîya min şare bû. Kilamên şînan xweş digot. Dengê we xweş û bi kelgirî bû. Li şîna hem ji mêran hem jî ji jinan ra distira. Şînen malê Moza piranî bi tenê dikir. Dîya min yeka yaraniçî bû. Wê roja şênahiyê ket rû Elê û got: ku tu mirî eza li ser te bistirêm!.. El kenîya û got: bêyî çi? Dîya min got: eza bêm:

Were were Elê were

Elê Alê bi biskên sor û çav çaqir e

Heqsizno, we çîma xeber neda min

ma ez bi xweşî batama ser e.

Meke meke felekê meke,

ê sibe da di ser Elê Alê da dawestiye bi tidarek e,

Li vê demê nawêmi li dama berê

Elê Alê kevanîya mala mezin e



Nur ji Yunaxê, Ela Hesê ji gundê Qereomera, Eşa Hemê ji gundê Altitera û Eşa Bostanê ji gundê Omera.
Ji arşiva A. Başaran

sêsid pez didot li pîyeki

*Ê niha ji nikane bi orxanê xwe, nakeve qetlê nanekî
Em ji şêst salî bi şuva derketinî ji gundê xwe wo
Li me herimî xewa şewa wo*

*Sewa xatrî va kurkana bûnî mabkûmê vê ceza yî
di navberî çar dîvarên xelkê da wo
Emê terinî bi hesreta dê û dota wo
Ê me têkin têbût, qûnê ucaxê wo
Ê cinazê me pevin gundê me, têkin herdê wo*

Bi va gotinan va El xemgîn bu û got:
–Lê ku tu ber min mirî!

Diya min got: tu nizanî li ser min bistirê!
Lê veng nebû. Diya min neh salan di
ber xaltiya El mir. Mirina wan jî wekî hev
bû. Hurd jî li rojaka şemiyê, di oda xwe da,
di yataxa xwe da mirin. Li rojek çarşemî bi-
rin welêt. Li pêncşemiyê, li gundê wan xis-
tin tîrbê.

Ji xaliyê hatin û çûn xaliyê.

Xas pê, yek ku rindiyê bike!

Songî tim mirinî ye. Kuva herî!

Erê, xeber hat, gotin: xaltiya El miriye.
Em çend cîran û heval, me kincên şînê li
xwe kirin, em çûnî mala xaltiya El.

Bi du oda insanî runiştine. Mêr li odakê
û jin jî li odakê.

Em runiştinî me şîna xwe kir. Wekî em
li gundê xwe bûn. Ji her dereka Stockholmê
insanên bilka û yên ji gundên doralî hatin.
Me bi xwarin, vexwarinê û sohbetan wekî
şînen gunda derbas kir.

Xaltiya El salên xwe nêzikî 90î bûn.
Neket ber destan û di wexta xwe de mir.

A rind em li xerîbîyê, hevdu li şîn û
şayîyan bi tenê nînin! Wekî malbat li hev
xwedî derdikevin.

Xwedê rehma xwe li wan bike!

– Amîn –

Meyîtê stêrkan

Cüneyt Dagdalan

Li derva berfeka spî, wek jinên ku gilyên xwe bi hevdu ra dikin, bi eşkere, lê bêdeng xwe digihand erdê... Li ezman çavên stêrkan wek kenê zarokêkî dibiriqîn. Her yek, bi tenê diweşî û li jêr xwe dikir hembêza lêhefa spî.

Şevê wek dayîkekê, stêrk di hundirê xwe de niximandibûn. Di hembêza wê da tenê çavên wan dibiriqîn. Carna ku mirov serê xwe hildida û li ezmanan dinêhirî, çîrûskên dibiriqî û wek bajarekî ji zêran avabûyî didît. Ne yek, ne du, ne sêsed û ne jî milyon... Li ezmanan wek xwelê rijîyane. Kes nikare bijmêre û kes nikare xwe bigihijîne wan... Zarokên şevê ne ew... Xeynê şevê kesek nikare wan di hembêza xwe da jî veşêre.

Min dixwest wek stêrkên li ezmanan rijîyayî, ez jî di hundirê dêya xwe da stêrkek bim... Loma wextê derdikevim der, xwe bi kincên reş diniximînim. Bi tenê çavên xwe vekirî dihêlim. Kuder tarî ye, di wir ra derbas dibim, kuder tîrojên ronî hene, ji wir paş ve vedigerim... Lê tu caran jî nabim stêrkek di hembêzekê da.

Dîsa li wan şevên tarî, li şevêkê min xwe li ser berfê dirêjkirî dît. Çawa û çing hatim vir, qet nayê bîra min. Bi çavên girtî li ezmanan dinêrim. Min, xwe wek şevê, berf jî wek çavên xwe dihesiband... Dibe ku ji jor ve di nav tariyê de, li ser erdê ez jî wek çavekî bibiriqim. Û ger ew jî nebe, li dawîya dawî wek dilopeka ji çavan ketî di nav berfê da winda bibim. Kes rêça min nebîne û nizane ku ez di wir re derbas bûme...

Ez li ser berfa zivistanê rabûm û bi dest û kincên ji sermê qerimî ketim rê, ketim rêyên di bin berfê da nexuyayî. Merasên min ji berfê, her yek wek topekî bûbû. Sar bûn, giran bûn û şil bûn... Bayekî rût, sar û hîşk digerrî li derdora min. Ji çixulên daran, cemed diweşîn. Çivîkek li ser darê bi çavên qerimî li min dinêrî. Ji min ne-tirsî, nefirî... Li benda tiştêkî din bû, li benda payîzê, li benda barana germa-hîyê bû... Ez wiqas nikarim bipê, ez ê di rê kevîm.

Piçkê şûn ve, li ser rêya rastî kalekî hatim. Min silav da. Û wî jî rêya xwe birî û

bersiva silava min da. Li min nêrî, dît ku ez xortek im. Û rawestî. Xwe bi piştmalê niximandi bû. Ji berika saqoyê xwe tebexa tutunê derxist, dirêjî min kir, min ji dest wî heyna û bi pêçiyên xweyî dicirifî cixara wî pêça. Di wê navberê da ji min pirsî: „**ji ku teyî û kuda diçî?**“

Min ê çawa bersiv bida, min ê çing bigota ez stêrkek im û li hembêzekê digirim? Min tale cixarê bi serî zimanî xwe şil dikir. Min li çavên wî nêrî. Fêhm kir ku dilê min jî dixwaze. Got; „**tu jî ji xwe ra bipêçe.**“ Sar bû, qefilî bûm. Min negot „**na.**“ Li ser vê berfê ar û dû, çîk û rijik wek hembêzekê germ xuya dikirin. Me her duyan jî bi hevdu ra vêxist. Ji serma ruyê me qelişî û tînekê xwe bi me girt. Got; „**keça min mir, ez ê îşev li mala wê stêrkan temaşe bikim.**“

Di lingên wî da soquyê reş hebûn. Bi kirtişên soquyên wî, li ser berfê tîltîlokên berfê peyda dibûn. Di bin merasa wî de qûlek jî hebû. Wextê ku xwe dilivand, li hêlê tîltîlokan tumik jî çêdibûn. Min dîsa li çavên wî nêrî. Wî çavên xwe berdan deşta berfê. Min jî serê xwe çerx kir. Ji

dûr ve dar wek qeretûnê disekinîn. Dûr bûn, reş bûn û li ser berfê sêwî bûn. Min xwe çerx kir xîşaxîşa li ber lingên min. Şîva wî ji dara mazî bû. Li ser şivê xêzik hebû. Xêzikên kûr, dirêj û reş li ber lingên min qulek çêdikir.

Cixare bi nivî bû. Nizanim ji serma bû, an jî tiştêk hat bîra, wî li ber çavê wî, dilopek peyda bû. Desmala xwe yî, wek pêşkîrekî derxist, carekê dewîşand û bi desmalê kêleka çavê xwe mîna mistdayî pak kir... Min jî bi destê xwe, helma xweyî li ser camê pak kir. Rûyî wî wînda bû li ber çavên min. Kulîyên berfê, li ser camê zêde bûn.

Di nav cêhên min de hîn ew kal li ber çavên min bû. Min ê çawa nivîsek li ser wî kalî binîvîsa? Ez rabûm û min dest pêkir. „Li derva berfeka spî xwe digihand erdê. Ji xeynî min kesekî rêça wî kalî nedît. Kesî nedizanî ku ew di vir re derbas bûye jî... Ne sîyasetmedar bû, ne qelaw (dewlemend) bû, ne nivîskar, ne jî nîgarmend bû. Kalek bû û diçû ser meyîtê Stêrkan... „

Serrastkirinek!

Di pîrozbayiya 10-saliya kovara Bînebûnê de, li ser pîrseka Radyoya Swêdê, Ali Çiftçî li ser çapa yekem a kovarê wiha gotibû: „...*Cara peşî di sala 1997an de hevalê me Hecî Erdoğan bi însiyatîfa xwe li Stenbolê hejmara yekem bi kêmasî be jî derxistibû.*“ Ya rast ne li Stenbolê, li Almanayê hatibû çapkirin.

Red.

Tirsa Tato

Ecewîd Yildirim

Dem pir nêzik bûbû. Tenê şevêk mabû. Haziriya xwe jî min gî kiribû. Di nav cîya da min xwe vir da û wir da çex dikir, lê xew nedikete çavên min. Her ku min di pencerê ra li stêrkên li ezmanan mês dikir, gundê me dihate bîra min. Min qet nedizaniyê ku bi hatina Almanyanê min rind kiribû, yan jî neçê kiribû?

Weke malbat em hîn ecer ji gund hatibûn Almanyanê. Bi qasî hefteyekî derbas bûbû. Lê ez dîsa jî hînî Almanyanê nebûbûm. Ji ber gava ez li gund bûm, her tişt li gora dilê min bû. Bi kalê xwe Hamoyê Yaylê va me tu bajar nedihîştin, em digeriyan. Bajarên wek Qonya, Enqere, Mêrsîn û Îzmîr min gî dibûn. Ji xwe qirqawa Qulekîyê jî ji min ra mîna nava gundê me bû. Em her ro lê bûn. Gava apê min Bilo bi qamyonê ji seferê dihate mal, dîreksiyona qamyonê dida dest min û em pê li nava gund çex dibûn. Şixosmanê xalê Şehmed jî hostê ker-kuçika bû. Pir caran gava ew diçû gundê cîran Burnaxliyê keran bidize, ez jî bi xwe ra dibirim. Gava me ker didizîn jî, me ew dianîn gund û em bi têra dilê xwe lê diniştin. Bi gotineke din, jîyana li gund pir şên derbas dibû. Lê belê Almanya ne weng bû.

Her kes bi berbanga sibê ra radibûn diçûn li fabrikayan kar dikirin. Bi êvarê ku jê dihatin jî, ku teng nan-mane xwe dixwarin şunda, xwe tenekê dirêj dikirin û dora dîna ya royê jî dîsa bi heman şiklê dewam dikirin. Ji xwe min nedixwest ku werim Almanyanê. Gava bavê min ji Almanyanê ji bo ku etkê min û min bi xwe ra bibe hatibû gund, min gotibû:

–„Ez tu narim Almanyanê!“

Wê çaxê kalê min ez bi Tato îqna kiribûm. Kalê min bi min ra gotibû:

–„Xorto niha zemanê te yê mektewê hat. Tu yê mecbûr herî mektewê. Ku tu li gund mayî tu yê herî ber Tato. Tu çûyî Almanyanê tu yê jê xelas bibî. Him jî, mehlîmên Almanan mîna Tato li talebeyan naxin, jê hez dikin!“ Ku min navê Tato bihîst ez dawestîm. Tato li gundê me mamosteyê dibistana sereta bû. Ew li gund bi tundbûna xwe bi nav deng bû. Talebe gî jê hundirçetî bûbûn. Hekaten di heqê wî da jî min pir bihîstibûn. Hevalên ku diçûn ber wî, tim qala wî û çoyê wî dikirin. Digozin;

–“Tato çoyekî xwe heye û li ser jî *Vicdansiz Tato* nivîsandiye.”

Carekê Resulî mala Erewî Alşêr qal kiribû û gotibû;

–“Ji ber ku wî bersiva pirsra wî nizaniye, bi têra qûweta xwe tiliyên wî çö kiriye.

Hevalê min Harûnî Henikê jî digot; Ji ber ku ew carekê dereng çûye mektewê, Tato bi şelmaqa li ber wî dawestiyaye.

Wek kurikekî ku heta wê rokê tu azarek nebihistî, çexê kalê xwe bûm û min pê ra got:

–”Temam, ez ê herim Almanyê. Lê ku mehlîmên wana jî mina Tato li min xistin, ez ê ji nû ve werim gund!” Hatina min ya Almanyê encama wê lihevkinê bû.

Gava şev bûbû nivê şevê, ji hêlekê ve bîranînên min yên gund, ji hêlekê ve jî pirsra rewşa mamosteyên Alman û heyecana destpêka dibistanê mîna vijikê di sere min ra derbas dibûn. Teve wan xewn û xeyalan, min cikê mês kir etika min bane min dike û dibê:

–“De raw-rawe, tu yê herî mektewê.

Demekî ez weng di xew da çûme. Ez ji cilê rabûm ser xwe, min kincên xwe li xwe kirin, dest-serçavên xwe şuştin, zikê xwe bi nanê ku etkê min hazir kiribû têr kir, tûrikê xwe avête pişta xwe û bi bavê xwe va me da rêya dibistanê. Di rê da tirs, xof û senaryoyên her cureyî di serê min ra derbas dibûn. Her çiqas kalê min gotibû, ku mehlîmên Alman ji kurikan hez dikin, dîsa jî tirsra ku ew ne weng bin dilê min dagirtibû. Lê ku ew jî kurikan çö bikin? Lê ku ew jî Tato êvatir bin?

Him ku ne weng bin jî, min dê bi zi-

manê almanî çir kira? Ji xwe min bi almanî ji „Ja“ û „Nein“ bêhtir tu tişteki nedizanî bû.

Bi wan hestên tevlihev em gihîştibûn dibistanê. Bavê min çû li ber deriyê sinifekê dawestî û lê tikand. Gava wî li derî dixist, dilê min jî bi heman rîtmê kutekut bû. Hêcana min gihîştibû asta herî bilind. Tirsra min yek jî ew bû ku mehlîm ji min tişteki bipirse û ez jî nikanibim bersiva wî bidim!

Li wê nema ji hundir dengê jinikekê hat û got:

–„Ja“.

Ku min dengê jinekê bihîst, heş û aqilê min bi tevahî li ber hev şaş bûn. Ji ber ku Tato mêr bû, min qet şike mehlîmeke jin nebiri bû. Ez tim li benda mamosteyekî mêr bûm. Hîn ku min hesabê mehlîmên jin û mêr dikir ku kîjan ji min ra rind be, bavê min derî vekir û mehlîma jin ji min va xay kir.

Wekî ku ji dengê wê jî dîyar bû, mehlîm jinikek bû. Bejneke wê ya qut û zirav, porekî qij û berçavikek gir jî di çava da hebû. Merî li halê wê mês dikir jê ditirsiya. Bavê min çû ber masa mamosteyê û bi almanî dest bi dengkirinê kir. Ku wana deng dikirin, min jî di taldîyê bavê xwe da suyê xwe dirêj dikir û li der û dora masa mamosteyê li çö digeriyam. Lê belê li der û dora masê tu tişteki ku dişibe çö-mo li çavên min neqelîbî.

Pir necû bavê min çerxî min bû û got:
–„Ez ê niha herim mal. Ev jinika jî mehlîma te ye. Di sinifê da rihet rûne, gurê mehlîma xwe bike û kesî jî eciz meke.“ Bi wê şîretê bavê min sinif terk kir, derket û çû.

Ku bavê min ji sinifê derket, mamos-teyê li min mês kir û bi almanî bi min ra dest bi dengkirinê kir. Ya ku ez jê tirsîya-bûm niha hatibû serê min. Min ji gotinên wê tu tiştek fam nekiribû. Min nikanîbû devê xwe jî vekim. Min tenê serê xwe kir ber xwe û bê ku di xwe da bilivim di şûna xwe da dawestîm. Mamosteyê dengkirina xwe dewam kir. Qala çî dikir û çî nedikir qet nizanîm. Lê belê mamoste bi dengêkî kîbar û nazik deng dikir. Ne bi dengêkî hêrs. Piştî demekî mamoste ji şûna xwe rabû û hat ba min. Bi destê min girt, ez birim birim paşîya sinifê û li kêleka lawikekî esmer bi şûn kirim. Paşê ji nû ve vegeriya şûna xwe û berdewamiya dersdanê kir.

Ez niha bûbûm şagirtêkî dibistana Alman. Bibe nebe min qalkirinên di heqê Tato û kiryarên mamosteya Alman di da ber hev. Di encama wê berhevdanê de derdikete holê ku di navbera wan herduyan de ferqeke wek reş û spî heye.

Berevajî Tato, mamosteya Alman ne çoyekî xwe hebû, ne li şagirtan dixist û ne jî li wan hêrs dibû. Wê bi awayeke xweşik ders dida şagirtan û min jî ji xwe ra guh dida ser wê.

Di berdewamiya dersê de mêla min kişand ku xêr ji lawikê esmer yê li kêleka min bêhtir, herkes teve dersê dibe. Tenê ew mîna min bêdeng li şûna xwe rûdinişt. Min di ber xwe da digot;

–Gelo ev lawika kî ye, çî tewa ye? Çima ew jî mîna min qet deng nake? Ma ew jî mîna min ecer ji gund nehatibe vê derê?

Min lawikê esmer meraq dikir û dixwest wî nas bikim. Min berê xwe bervê kir û got:

–Navê te çî ye lo?

Lawikê esmer li min vegerand û bi dengêkî neyênî got: “Ne diyon len? Doğru konuşsana!”

Derdê ku pê nemirî! Tirsî min tim almanî bû, lê niha tirkî jî lê zêde bûbû.

Ji ber ku ez li gund neçûbûm dibistanê min tenê kurmancî dizanîbû.

Min tirkî fam dikir, lê nedikanî deng bikim. Min tenê çat-pat li hev diqelîband. Ew jî gava em bi kalê xwe va diçûn Qulekîyê û bajaran ez fêr bûbûm.

De tu were wê, hişyarkirina bi rast-dengkirina tirkî jî li min bi qar hatibû. Loma min di hindurê xwe de digot;

–Çi dibe ma bibe ez ê bi vî lawikî ra tirkî deng kim. Min careke din berê xwe bervê kir û got:

–*Senin adın ne lo?* Lawkê esmer got:

–*Benim adım Ünal. Senin adın ne?*
Min jî got:

–”Benim adim jî Ecewîd.”

Bi vê diyalogê baweriya min zêde bûbû û min dixwest bi pirsra ku ka ew almanî dizane dewam bikim. Min lê mês kir û got:

–”Sen almanca biliyon?

Lêwik got:

–”Yok bilmiyorum.” Vê care bi meraq min jê pirsî:

–”Sende jî Türkiye’den ecer geldin buraya? Lawikê esmer careke din dengê xwe bilind kir û got:

–”Ne biçim konuşuyon len, anlamiyom seni.” Ji bersiv û helwesta lêwik min anîbû der ku em bi tirkî nikanin bi hev ra deng bikin. Ji hêla din ve, tirkî ji min ra bûbû mesela prestijê. Min di ber xwe de got; „Madem ez bi tirkî nikanim deng kim, ez jî dê bi tirkî kilama jê ra bistirêm.“ Min careke din di lêwik kuta û got:

–”Ben tirkî bilmiyom ama tirkî kilam biliyom!” Lawikê xizan ji nav tirkîya min dervediket û tenê bi awayeke matmayî li min mês dikir. Tevî wê min dest bi kilamê kir:

*Oy oy oy oy Emine,
Çekme beni Emine,
Ben seni çok seviyem lâ,
Imanima dinime.....*

Hîn ku min kilama xwe teva nekiribû mamosteyê bi dengê bilind navê min hilda û bi almanî çend gotin li dû hev rêz

kirin. Her çiqas min bi almanî nizanîbû jî, bi hişyarkirina wê ez ber da çûbûm. Lê hişyariya wê ne xema min bû. Ez bi derdê dengkirina tirkî de ketibûm. Ji xwe ew ne Tato bû jî. Wê ne çoyekî xwe hebû û ne jî li şagirtan dixist. Lê min dîsa jî dengê xwe birîbû. Ku mamosteyê ji nû ve dest bi dersdanê kir, min jî hay li kilama xwe ya din kir:

*Ayaxinda qundura,
Yar gelir dura dura,
Ölürem ben ölürem way.....*

Min cikê mês kir, mamosteyê careke din bi dengê bilindtir navê min hilda û bi almanî çend tişt gotin. Ji îşmara ku li min kirî jî min fam kiribû ku bang li min dike. Ez bi awayeke ji xwe bi bawer ji şûna xwe rabûm ku herim ba mamosteyê. Bi rê da ez difikirîm ku li hember wê ez çir bikim. Ji xwe min sûcê xwe jî dizanîbû. Lê ne xema min bû. Min di ber xwe da digot; gava wê tiştek bi min ra got, ez dê her du şorên almanî ku min dizanîbûn jê ra di rêzê kim. Ez ê carekê bêm „ja“ û carekê jî bêm „nein.“ Hêviya min ew bû ku bi wî awayî xwe ji nav meselê derxim.

Gavê ez hatibûm ber masa mamosteyê, bêdengîyeke xof çar hêlên sinifê dagirtibû. Çavên şagirtan tev li min û mamosteyê bûn. Mamosteyê jî wekî ku min texmîn kiribû, pîrsek bi pîrseke din ve

girê dida. Her ku wê ji min pirs pirs dikirin, min jî ja û nein dikirin rêzê. Min cîkê digot „ja“ û cîkê digot „nein“. Piştî demê mamosteyê dawî li pirsên xwe anî û ji kotika masê kêrek derxist. Gava min kêr dît, ez ketim nav tirs û gumanan. Mamoste kêr danî ser masê û bi almanî careke din tiştek got. Lê belê vê carê dev li min ve nebûbû. Mîna cara paşiyê min nikanîbû bêm çit jî. Dû re mamosteyê careke din kotika masê vekir û jê şêriteke banda birînê derxist. Ku min banda birînê dît, ning di bin min da sist bûbûn. Min di ber xwe de digot; „Va jinikê pîs û mehde yê ku min şerjê ke çî ye? Xaskê ez bi ço û kutên Tato bihatama ser. Qet nebe wî kêr-mêra xwe tune bû.“

Mamosteyê kêr kir dest xwe û banda birînê bi qasî lepekê birî. Naylona li ser jî dirand û bi dest îşmara min kir ku ez nêzîkî wê bibim. Vê carê min ew fam kiribû û bi zanebûn serê bakir û got: „Nein.“ Ser wê re mamoste jî şûna xwe rabû û ber ve min hat. Bi serê min girt û banda birînê girt bi ser devê min de nus-kand. Ku çîng mamosteyê banda birînê bi devê min da nus-kand, vîqe-vîq bi ser şagirtan ketibû. Şagirt gî bi hev ra bi min dikeniyan. Min pir fedî kiribû. Jî fediya ra ez sur-purtkî bûbûm.

Gava mamosteyê ez jî nû ve şandim şûna xwe, bi ser da jî lawîkê tirk bi min

ra got:

– „Şimarîrsan, öğretmen de sana böyle yapar işte!“

Min qet dengê xwe nekir heta ku wê rokê dibistan bi dawî bûbû.

Bi dawîbûna dersê, mamoste hat û banda birînê ji devê min kir. Tiliya îşaretê jî li min ba dikir, mîna ku bibê; „Careke din di sinifê de kilama bistirê, ez wê çaxê ji te ra dizanim.“

Gava ez hatim mal, min qet dengê xwe nekir. Ser wê re etikê min got:

– “Tu çima qet deng nakî, qala mektewa xwe nakî?”

Min got:

– “Tişt tune lê.”

Etika min bi bersiva min nehatibû ser û got:

– „Na na, tişteki te heye. Ku çî derdê te heye, ji min ra bê.“

Ser wê re, min hal û hekata xwe yek bi yek jê re got. Etikê min jî:

– “Te xwe şaş kiriye? Tu ji xudê be-la xwe dixwazi? Te li mektewa gund kilam bigotana, Tato yê ji te ra kat kira. Tu mehlîmê alman heyne bi ser sere xwe de!”

Fotera Huber

Yusuf Yeşilöz

Li dawetê Xalê Memed mîna hertim kinca xwe şîn û fotera xwe reş li xwe kirîbû û li ser îşligê spî qrawata sor xwe mîna alayekê nişan dida. Di destê wî de keçikek xort hebû, ya ku min, ez ê ku malbata wî gihîştê nas dikim, heta îro qet neditîbû. Xalê Memed, **keçik di destê rastê de**, hat ser min û mîna ku min ew nas dikir, dikeniya. Cigara puro ji di destê wî yê çepê da bû.

Hîn ew negihîştin cem min, Xalê Memed bi dengê bilind û quret dest bi gotina xwe kir: „Lise ogretmeni! Lise ogretmeni!” (ew Mamosta lîseyê ye). Wî bi tiliya xwe ji îşarata keçikê dikir. Eger ku Xalê Memed xwast bala kesan bikîşîne ser tiştên girîng ew gotina xwe dubare dike. Bi du pirsan min karî hînbibim ku keçik torina wî bû û navê wê ji Ozlem bû.

Ji Memed re herkes ji bo wê yekê dibêje “Xalê Memed”, ji bo ku bi herkesî re alaquadar dibe, derdên herkesî dike derdê xwe. Misal eger yekî kurd yan ji tirk,

nas yan ji nenas, li xestexanê be, Xalê Memed herroj diçe seredana wî û dixwaze ku herkesê kurd jî here wî nexwaşî bibîne. Li xestexanê hemşîre û toxtor wî herî baş nas dikin û ew ji papazê Xiristiyanan ku tê seredana nexwaşan jî navdartir e.

Piştî me ji xwe re vexwerin anî. Ez lê ecêb mam ku Xalê Memed şerabê vedixwe û ji torina xwe pirsî ka ew şerabê vedixwe an na. Ozlemê got, ez bi zîkê birçî nikarim alkolê vexwim. Xalê Memed keniya:

“Keçikê vê demê ji xwe pir hêz dikin.”

Ozlemê destê xwe avêt ser mile kalikê xwe:

“Min canê xwe li çopê nedîtiye!”

“Vê keçikê pi perê min î Swisrê zanîngeh xwand, perê min helal in.”

“Dîsa jî min xwand, lê te perê xwe yên din kirin erdê û îro kesek li ser naşuxule, qertel ji li ser nasekinin.”

“Dem ê were keça min, dem ê were. Ew erdê min ê bibe bihayê zêran. Min perê xwe bi helalî qezenç kirin, ew tarê narin.”

„Tu jî hêdi xort nabî ku tu li ser traktorê rûnî û erdê bajoyî. Ji aliyê din jî tu hînbûyî foterê û wê tene wexta ku terî rakevî ji serê xwe derdixî.“

Xalê Memed li min mêze kir û keniya:

„Ew foterê xwedî fabrikêyî rehmetyê bi navê Herr Huber bû, diyarî min kir. Ez heta roja ku dimrim wê ji serê xwe dernaxim.“

Çîroka bavê Ozlemê di bîra min da ye. Xalê Memed ew ji min re hezar carî gotiye. Wexta ku wî sala 1974 malbata xwe anî Swisseyê, lawikê wî yê mezin Haydar gihîştibû salên reşîtî û qanûnên Swisseyê ew qabûl nekiribûn. Pênc kurikên Memedê din karîn ku li Swisseyê bimînin û îro giştik bi mal û kar in. Ji bo mayîna Haydar li Swisseyê wî pir zehmetî kişandî bû, ebuqatên bi biha jî girtî bûn, lê tu çare nedîtibû; Haydar bi tenê li gund mabû. Xalê Memed hertim digot:

„Dewleta Swisseyê hingê mina zinaran hişk bû. Piştî çend salan min ji Haydar re firinek sand û Haydar zikê nivîyê bajarê Erzinganê têr dikir. Xwedê ji wî razî, wî kurikê xwe dan xwendin û niha ji ew ji kurik û torinên min ê li vir pir rehetir in.“

Xalê Memed îro 72 salî ye, ew li sala 1966 hatibû Swisseyê. Ew hîn bi fêz behs dike ku wî li Stenbolê mûdirê fabrikake Swisseyê li bîna „Işçi bulma kurumu“ „qandirmışkiriye“ (xapandiyê.), ku ew xwedî xwendin û nivîsê ye. Ew mîna destanakê qala wê hekatê dike, ewqes zindî ye ku merî dibêje, ew di demeke nezik de di sere wî de derbas bûye:

Xalê Memed li Zonguldakê li oxaxê komirê kar dikir. Ji gundê wî xeber jê re şandin ku ew here Stenbolê: „gavurêk hatiye û insanên bi dest û lap dibe Swisseyê.“ Serê sibehê wî serçavê xwe ku ji xoliya komirê reş bûbûn bi sabûna kesk şuşt, kincên hevalê xwe jê sand, hevalê wî rihê wî kûr kir, qêlmusk jî lê kir.

„Bi dûre bang min kir û got: Tu mîna zavaî xort xuya dikî! Ez lê vegeyriyam û bi tene pê keniyam.“

Wexta ku ew li Stanbolê li ber bîna zer û duqat peya dibe, dilê wî mîna deholê lêdikeve. Ew ewqes bi heyacan e ku te ê bigota dikeve xaniyê bûkê yî bi çaqma. Li ber bîna zer demeke direj disekine, cesaret nake ku here hundir.

„Hîngê min bi tenê dixwast ku cigarekê vexim, lê qolçiyê bîne bi min re got: meze ke ma bîhna cigarê û xû ji te neyê.“

Dibe ku mûdirê Swissreyê kesê wûsa qe-
bûl neke.”

Qolcî kolonyayê li dest û rihê wî di-
ke, wî bîhn dike û bi ken dibeje: „Bira,
edî bîhna gula ji te tê!“ Piştra di dest re
digre û dibe qatê duduyan cem mirovên
din ên ku dixwastin biçin Swissreyê li
kêleka dîwar rêz bûbûn. Wexta ku Xalê
Memed dikeve rêzê, xwe dide kêleka
mêrên bejndirej bi porê reş **mîna zey-**
tûna û simbelqît, heyacana wî namîne.
Gişka çavên xwe bi meraq berdabûn
mûdirê Swissreyê, te ê bigota ew ê bileta
cennetê bide wan. Mûdir mîna qesebên
hosta ku ji bo pez sandinê dihatin gun-
dan li ber mêran diçû û dihat, ji nigan
de heta serî li wan miqêt dibû. Carina
bi serê xwe yî bêpor îşaret dida memûrê
tirk, ew ji li merikê hatî tarîfkirin vedi-
gerî û digot: „Bira, du dikarî li derve li
benda min dawestî!“

„Bi wê ûsilê nivê mêran hat veqetan-
din. Mûdir bi tenê mêrên gir û bi qeflet,
bi dest û ning hilbijartin, te ê bigota ew
Cumhurbaşkanî Muhafız Alayı dibijêre.“

Piştê ew çû der, memûrê tirk ji vî re
çayek hazir kirîbû û dixwast ku ew li ci-
hekî xewle bi tenê vexwe. Memûrê tirk î
bejnqût bi şunda vejerî qûrfê û bi lez di
guhê wan de kire pistepist ku ew nivîsek
biçûk ji rojnamayekê bide wan û ew tax-

mîn dike ku kes ji wan nikare bixwîne û
binivîse. Wî bi çend gotinan naveroka
nivîsê ji me re got.

* * *

„Taxmîna wî li cîh bû. Min qet tu caran
rojname nekirîbû destên xwe. Wexta ku
midûre Swissreyê hat hundir û ji me pir-
sî ka kî ji me dikare bixwîne, me gişka bê-
tirs dest dirêj kir. Midûr bi serê xwe tarî-
fa memûr kir û wî jî parçeyê rojnamê bi
rêzê da me. Her yek ji me ku rojname kir
destên xwe bê dudilî, mîna mamostayekî
dest bi xwendinê kir: „Li riya navbena
Enqere û Sêvasê qezayek bûye û penc
kes mirine. Şoferê postê di xewde çûye û
li ereba hespa xistiye. Hesp û penc jin û
mêrên li ser erebê li cîhê qezê mirine.“

Piştî ku bi rêzê her merîyî ew xebe-
ra «rast» xwend, midûrê Swissreyê bi
rihekî bi kêf mihîrê li ser kaxiza ku di
dest memûrê tirk de bû dixê û diçe der.
Memûrê tirk **mêrên simbelqît pîroz di-**
ke, ew ji perê şorbayekê didin wî.

“Heftekî ji xwendina rojnamê bi
şûnda ez li trenê siwar bûm û hatim
Ewropa. Gundiyên min digotin: Ew rê-
vitîya te ya cennetê ye, lê min zûh fahm
kir ku ew ne cenneta ku me dizanî bû.”

NUH

Ji bo Nuh û gelê wî yê kurd

Rafik Schami

Ji bo me xwendevanan derbeya eskerîyê tê meneya sê û çar roj tetîlbûna dibistanê. Derbeyên Şamê zû dihatin helnan û deynan. Derbe pir caran li berbangê dibin. Em nişteciyên taxa bajêr ya kevn, wê carê pêşî ji radyoyê dibihîzin. Ji nişka va dibe bêdengî, di pêy va muzîka merşê lêdikeve. Bi vê em têdigihên ku derbe serketî bûye. Li ba derbeyên serketî em dengê sîlehan nabihîzin. Kîngê ku derbeyek bi serneket û liberhevdan şên bûn û dirêj kirin, hîngê me diredira sîlehên otomatîk û gumnîya lêketina bombeyan dibihîst.

Demekê muzîk lêdikeve û paşê daxûyanîyên rejîmê nû yên ku pê ji bo her tiştî rejîmên kevn tîsîncarkirin dest pê dikin. Daxûyanîyên weha ku, mîna ku bibêji derbekaran ji hevdu wergirtine, pê rejîmê kevn ji ber hebûna xeraxwarî û îltîmasîyê û xelaskirina Felestîne tîsîncarkirin. Rejîmê nû şor dide ku xeracê ji kok da rake, li her derê edeletê bi cîh bike û bi destavêtinekê ra Felestîne xelas bike. Apê Selîm ji min ra kat kiribû, ew pê derbeya pêşîn ya panzdeh sala berê pir şa bûyê û hetanî serê

sibê şahî kiriye û vexwarîye. Li derbeya diduyan wî tenê dest li hev xistine û ji derbeya sisyan vir da jî tenê dikene.

Çend rojan berî ku rejîmekî nû bi zorê yê kevn dabû ber xwe, bavê min va ji min ra kat kiribû:

“Serdarên nû di gerîna li kokên xeraxwarîyê da diketin nava vê gijgiloka mezin ya pêçekgîya û ji şîrîniya wê tam dikirin û pê jehrîkirî dibûn. Ji ber vê ew zû kevn dibûn û birçîyên nû şûna wana digirtin.”

“Te va baş got ... Erê, jehra şîrîn wana zû kal dike... Te va baş got” apê Selîm pesand, gava ku çay vedixwarin. Ez bi bavê xwe serbilind im, çimkî apê Selîm pir kêr heq dida yekî mezin. “Lê Felestîne?” min pirsîya.

“Bi destavêtinekê” apê Selîm gotina radyoyê dubare kir û kenîya.

“Emerîqa” wî dewam kir “bi du destavêtinan, Rusîya bi sê destavêtinan dê bîhalkirin” û kenîya. “Lê Sowyet hevalên me ne, wekî ew ê di radyoyê da tim dibîhînin” li dijî derdiket.

“Radyo?” çî vir e ne? Ji serdarekî ku xwedîyê destavêtineke wengna ye ra he-

val ne lazim in. Tenê di sê mehan da rejîmekî nû dê bê û bibêje, yê kevn di-kanîbû Felestîne xelas bike, eger wî destek nekiriba qirka me û bi yê din bi dizîkî pere nekişandibana Swîzrê.

Mamosteyê me yê tarîxê di hebis-xanê da ye. Me heftekî di pêy derbeyê hay jê bû. Felestînyekî sempatîk bû. Ew î komîk bû û ji pirtûkan pirtir kat dikir, ji ber vê va li îmtîhanan kêma dipa. Êdî min bawer nedikir ku rejîm ê bikane bi destavêtinekê Felestîne xelas bike, çimkî min destê wê yê bê wîjdan li ser qirqa wê hîs dikir.

Mamosteyê nû yekî tirsonek bû. Ew ne xem bû, ji ber ku piraniya jîrekên dibistana me simtirsonek bûn. Ji ber ku ew ê surgunê dibistaneke li “Sibîryayê” bibin, dil li wana diqetîya. Sibîrya li ba me herêma li hududê îsrailê bû. Tu mamostekî nedixwast ku here wira, karkirina li dibistaneke xerabtir li Şamê ji yê li dibistaneke li Sibîryayê baştir bû.

Em bi tirsonekiya mamosteyekî bi ber xwe nediketin, tenê dilê me pê dişewitî. Lê mamosteyê nû yekî pir berbed bû. Ji dersa yekê bi şûn da min tê anîbû derê ku ez û ew nikanin bibin heval. Wî ji hêjmaran hez dikir û dersdana wî her ku çû em gêj dikirin.

Me hîn nû xanedaniya emewîyan ji 661 an hetanê 750 î xelas kiribû. Mamoste bi eşqekê qala kirinên emewî-

yan dikir. Weng xuya dikir ku coxrafyayê li ba wî qet tu rûmete xwe tune. Çimkî cîhan li ba wî ji Erebaştanê û ji çend welatên di siya ereban da pêyda dibû. Ew ji gotina ku ereban pir welat vekirîbûn tê nedibû. Kingê ku dor di hate bejeya “vekirin” ew diqîrî, wekî ku ew serbilindîya xwe pê fetihkirinê zelatir bike.

“Çima vekirin û ne fetih kirin? Ma welat girtîbûn?” Nuh, xortekî kurd, yekî tim nexwaş lê cesur, pirsîya.

“Helbet vekirin, ehmaqo, ew ji şarestanîya ereban ra hatin vekirin û ji hovîtîyê hatin xelaskirin.”

“Paşê osmanîyan çarsed salî û frensiyan bîstûpênc salan em vekirin” Nuh dîsa xwe avête ber.

“Ev kolonîyalîzm e. Ev tiştêkî bitûn wekî din e.”

Em bi mamosteyê hêrsrabûyî kenîyan û îsmail ji rêza paşîyê da bang kir:

“Yanê ez, erê? Ez naxwazim ku kesek min vebike.”

Hêrsê mamoste rabû, wî bi cetwel li maseyê xist.

“Va çi şeref e ji min ra ku ez ji keriyekî weng budele ra dersa tarîxa ereban ya bi şan û şohret bidim.”

Wî berê xwe da Nuh û belûbel li wî mêze kir.

“Tu tu, rabe!” Nuh rabû ser piyan û li çavên mamoste mêze kir. Wî qet serê

xwe xwar nedikir, gava ku mudurê dibistanê bi wî ra deng dikir jî.

“Ma tu ne serbilind î ku tu ereb î?”

“Na!” Nuh bersiv da.

“Çawa? Çi?” mamoste qehirî û bi çavên gewrkirî lê nihêrî.

“Ew kurd e”, hinekan bi pistepist-kî gotin.

“Erê! Ez kurd im” wî tesdîq kir.

“Çi kerema xwe? Kurd? Ew tunin! Rûne!” mamoste qirîya.

Me dizanîbû ku li Suriyeyê di ser sêsedhezari ra kurd hene. Em bi Nuh û çend hevalên wî yên kurd va dileyîstin. Wana ji me ra qala tekoşîna partîzanan dikirin û me ji Fasê bêtir hay jê Kurdistanê hebû. Mamoste tenê emewiyên xwe yên ku dinyê lê matmayî mabûyê dizanî. Pêdapêda kîngê ku me emewî ji paş va hiştin, wî nefret a xwe gişt ber bi pêxasên ku textê hukumdarîyê ji dest hevdu radikişandin kir. Nuh bi mehan bêdeng ma, hetanî ku em gihêştin mijara “seferiyên xaçperestan”. Dibistana me milkê civata xiristîyanan bû û mamoste ji ber vê di bi-jartina şorên devî xwe da di tengîyê da bû. Wî bi awayekî zelal got ku hurmeta wî ya mezin ji xiristîyanan ra heyîye, lê keriyên êrişkarên evrupî yên ku ji hez-kirina yê hêlê xwe bepar mayîne xinzirê rasterast in. Xiristîyanên ji Erebaştanê di ênîya pêşîyê da li hemberî wana şer kiri-

ne. Gava ku wî Seleheddîn yê ku enîya xwe dabûbu ber fetihkarên evrupî, mîna serdarê ereban binav kir, Nuh mîna ku derzîyek tê ra kiribûn, firîya.

“Seleheddîn kurd bû” wî bi hêrs got û em gişt mat man, me va nedizanîbû. Her çiqas ku gorna Seleheddîn li Şamê ye jî, lê di tu pirtukan da di derqeha kurdbûyîna wî da herfeke tenê tunebû.

Bi rastî Seleheddîn yek bi devî evrupîyan va dabû bû. Ji ber vê ye ku generalê leşkerê Frensayê, dema ku wî Şam fetih kiriye, di serî da çûye ser gorna Seleheddîn û qirîye gotiye:

“Em dîsa hatin.”

Merivên salmezin gişt îro jî qala vê dikin.

“Seleheddîn muslimanekî mêrxas bû. Wî erebeyatî parastibû û lewma di dilê xwe da ereb bû” va pûç bû. Îsmail bang kir: “Hîngê ez ji Marlon Brando me.”

Em kenîyan, çimkî me dizanîbû ku Îsmail bi awayekî xwedêwarî ji Marlon Brando hez dikir. Ew ne tenê diçû her filmekî wî, her weha wî sufetên wî gişt distandin.

Nuh li meha gulanê nota xerabtir kiribû. Ji hîngê pê va ew di dersê da kêmdeng bû bû.

Di serê hezîranê da ew du hefteyan xuya nebû.

“Ka goya kurdê me?” mamosteyê

tarîxê bi tonekî xêrnexwaz pirsîya û kûr li çavên xwendevanan mêzê dikir, çima ku me dizanîbû ku Nuh pît nexwaş bû.

Danê êvarê min li pastexaneyê çend seetan alkarîya bavê xwe kiribû. Min bi dizikî pasteyek helna û ez bi lez çûme ba hevalê xwe. Taxa xizana ya li kenarê rojhelata bajêr ji taxa me xizantir bû. Li wir gundiyan xizan yên ku xizanîyê dabû bûn ber xwe dijîyan. Ji bo kargerîna hatibûn Şamê. Xaniyên xwe bi kerpîç, texte û tenekeyan bi hev da kiribûn û hukumetan li ber vê çavekî xwe digirtin. Hemû hukumetan van xaniyana wekî bê miseda binav dikirin, lê va ne xema nişteciyan bû. Tu rêyê wana yê din tunebû. Wekî yên berê rejîmê nû jî soz dabû ku ji nişteciyan ra xaniyên însanî amade bike.

Zîqakên bi şekla marwarî di navbera holikên nizm ra derbas dibûn. Li her derê bermayî li cadeyan hebû, zarok li vir û wê ji yên li taxa me bi wêrinîtir dileyîstin. Min ji zarokekî pêxas holika Nuh pirsîya û ew bi lez kete pêşîya min.

Wekî li ba piraniya yên li vir, derî ji textên ji kodikên kevn yên barkişandinê bû. Min li dêrî xist û keçikeye pir bi şuhret derî vekir.

“Hevalekî Nuh” wê berbi hundurê malê bi zimanê erebî got û derî nîvvekirî hîşt û bi fedî bi min ra kenîya.

“Were hundur xorto”, mêrekî bejn-dirêj bi dostitî bange min kir. Destê xwe dirêjî min kir û keçika ku sorbûyî bi kurdî azar kir. Li paş dêrî tenê odey-ke gir û tarî hebû. Nîvîn li quncekî hetanî ber ban helçinîbûn. Dayka Nuh bi rûkenî ez silav kirim. Mêrê dirêj, apê Nuh silava dayikê wergeranda ser zimanê erebî. Bi dest lihev pêçikîniyekê min barê dest xwe da dayê û çavê xwe li Nuh gerandin. Li quncekî li ser doşagekê bû. Li kêlêka wî mêrekî kal rûniştibû. Ez paşê pê hesiyam ku ew bapîrê Nuh bû.

“Tu çi tiştî dikî?” min pirsîya û destê Nuh yê bi alaf gûvaşt. Kenekî westîya bi rûyê wî da hat.

“Te ji bo min zehmet kiriye?”

“Wer mebeje lo! Ez ji dil da tême serdana te. Yên din jî xwastibûn ke werin, min ji xwe bi xwe ra got, ez lez bikim ku ji pasteyê parek têkeve min. Eger Îsam hat tişteke ji ber namîne.”

Nuh bi bîranîna şerkarê sinifê, Îsam kenîya. Apê ji dayikê ra werdigerand, ji ber ku wê ji denkirina me tenê yek peyvên erebî fem dikir û ew jî kenîya. Li derva tarî bû. Dayik rabû û çireya rûn vexist.

“Va çi ye? Elektrîka we tune?” ez mat mam, çimkî li holik û beraqeyên din ampulên ku bi dar da ba dibûn, ronîyê elektrîkê didan.

Rejîmê nû, Xwedê bela wana bide, bona ku em ji vir birevin herin, elektrîk birrîye” kalemêr bi erebîyeke bilind û bi hêrs qal kir.

“Û çî ye te heye?”

“Ax, tenê sermayeke neçê?” Nuh bersiv da û kurt kuxîya. Dayikê ji birayê xwe pirsîya, wî ji bo wê wegerand. Wê bi helekel ji wî ra got û wî jî ji min ra got ku di dilê Nuh da xetayek heye. Min hetanî wê rojê nedizanîbû ku xetaya dil çî ye.

“Virt, dilxeta! Xeta di serîyê doktor da ye. Ez î pît wekî hespekî me”, Nuh xwe diparast û dîsa kuxîya. Diya wî bi xemxwarî û diltîrsî li wî dinêrî û paşê rabû ser xwe û di paş perdeya ku quncê şîvkelandinê ji odayê vediqetand da wenda bû.

“Bavpîr, ji hevalê min ra serpêhatîyekî kat ke. Ew ji tiştê kevn hez dike.”

“Ez bi erebî baş nizamim, gelo hevalê te çîma bi kurdî nizane?”

“Ew ereb e!”

“Wer e û? Ma ereb nikanin kurdî bihêvisin? Ew frensî û îngilizî dihêvisin ...”, mêrê kal dest ba kir, “di demeke nêzik da tu jî êdî kurdî nikanî.”

Ahenga dengê wî xembar bû, mîna dengê dayika min, gava ku wê lome li min dikir ku ez zimanê wê nikanim. Ew bi arameyî deng dike, zimanekî kevn ku tenê nişteciyên çend gundan pê deng

dikin. Îsa jî bi vî zimanî deng dikiriye. Apê Selîm dikane bi arameyî deng bike. Carekê, gava ku ew serxoş bû, gotibû romayîyan Îsa çarmix nekirine, ji ber ku wî gotiye ku ew lawê Xwedê ye û romayî pir xwedeyî bûn, lewma xwedeyek kêman zêde ne xema wana bûye. Romayî ne bîhteng bûne, lê wana Îsa çarmix kirîye, çimkî wî bi arameyî gotin kirine. Nuh çav di ser hev ra hêl kirin û pêçekê bêdeng ma.

“De baş e”, wî ji nişka va got, “bi kurdî kat ke û ez ê ji hevalê xwe ra wergerînim.”

Bavpîrê wî kat kir û Nuh jî wergerand, lê sê û çar rêz wergerand bi şû va, wî dest pê kuxîna kir. Min kerem kir ku ew biterkîne, çimkî ew pê diwestîya û ez jî pê şa nedibûm.

Bavê Nuh pir dereng ji kar vegehiya mal û xwe şûst. Daykê biroşa sebze da ser peştemalekê û deyna nava odayê. Min dixwazt ku ez herim, lê Nuh ez bernedam.

“Hetanî ku te nan û xwê bi me va parve nekir nabe”, bavê wî tesdîq kir û li ba Nuh xwarin bi min pir xwaş dihat.

Sê rojan bi şûn da, min xwazt ku bi Îsam û Îsmail û hineken din yên sinifa me va herin serdana Nuh. Lê serê sibe xeberek mîna bombeyekê li dibistanê ket. Nuh di pêy emelîyeta dil va mirîbû!

Mamosteyê fizîkê misede da ku em

danê êvarê herin binaxkirina Nuh, lê kêm kes bi me ra hatin. Binaxkirina wî di eynê rojê da bû. Xizanê bajarê min weng bêdeng dimrin. Dîya mim digot, ji mirinîya xizanan û pezewengîya dewlemendan haya tu kesî nabe.

Halekî pir xemxwar bû. Dayik li berderîyê malê digrîya û birek mêr bi ber dilê bavê yê ku benzûbed lê qetîya bû da diçûn. Wî xwe li tabutê Nuh pêçabû, te ye bigota ew î nexwazê ku Nuh berde. Destê wî mîna rengê erdê gewr xuya dikirin û tijî qeçîmanik bû. Min dît ku bavpîr firak dawestîbû û hewên gîrî bi ser rûyên wî yên kurnekirî da dixûşîyan.

Gava ku tabutê Nuh ji odeyê derxistin, ez berbi bavpîr meşîyam. Min nikanîbû ku berketina xwe veşêrim û gava ku min pê destê wî yê nasîrgirtî girt,

wî dest pê girî kir. Wî li min mêze kir, paşê ez pît hembêz kirim û serê min maç kir.

“Nuh ji te pir hez dikir”, wî bi pistinî ji min ra got.

Ez têr girîyam.

Kurê gandan (orispî), mamosteyê tarîxê dilê wî şikenabû, min cîlê ji xwe bi xwe ra got. Ez ê li ser textî reş binivîsim: Di vê sinifê da Nuhê kurd jîya. Li ser dîwarên dibistanê û li ser gewdeyên daran yên li beçeyê dibistanê, li her derê ew ê vê bixwînin.

“Bavpîr, tu yê min hînî kurdî bikî?”

Li veşîrîna min ji bavpîr pêşnîyaz kir.

“Li ser serî û li ser çavan, ku te xwazt.”

Min xwazt, çimkî ew zimanê Nuh bû.

Wergêr: Nuh Ateş

Jêrenot:

Ev kurteçîroka li ser navê “NUH” ji pirtûka Rafîk Schamî ya bi navê, “MÊŞDOŞ” hatiye wergirtin. Nuh Ateş ew ji zimanê elmanî wegerandîye kurdî. Rafîk Schamî ji Surîyê ye, bi eslê xwe ji xelkê arameyî ye. Ew zû va ye ku li Elmanyayê dijine û bi elmanî dinivîsîne. Nivîskarekî bi nav û deng e, li Elmanyê û li pir derên dinyê te naskirin û xelatên serketinê bidestxistine.

Heyfên Beqan –II

Uskî Cîmik

Mêrik ji berîya xwe cixarek derxist, ew vêxist û dûmana wê li ser rûyên wî belav bû. Mij li serê çîyan li ser hevdu dicivîyan û giran giran ber ve gund xwe xûj dikirin, êdî ew diketin nav malan. Ro li aso gogekî sor bû, di çavên mêrik de dipertitilî. Mêrik li hêla çem bû, ew ji çem gavek dûr bû. Wî li ser pêyên xwe çepê û rastê meze kir, li herdu hêla jî mirov ketibûn rêze, di navberî her mirovekî de bi qazî pênc şeş gavên mirovan hebûn. Merik çokê di dest xwe de helan, ew li ser serê xwe du se caran bakir. Tê rêşkê çavên mirovan de ar vêdiket.

Mêrik li ser rûya ava çem, li ser pelege biçûk beqek dibû, wî çav berdabû beqê. Mêrik bi çokê dest xwe bilez avit avê, vê re ewr dirîbû û dikir wîsa wîs. Çokê wî li ser beqa biçûk ketîbû. Bi lezbûna çokê av bi du aliya bû, ew gelişt, minak tu bibêjî Musa û meriyên wî tê de derbasbûne. Beq bi du sê aliya bû, dilopekê xwîna wê li ser zinêr ketîbû.

Nîvî ro di erdê re çû xar e, li ezman qat bi qat ewrên sor digirt. Ji dûr ve

dengê keçelokan dihat. Mij êdî ketîbû nav gund, wê li malan xwe dipiçand, mal tê de dihatin fetisîn.

Ava çem giran giran sor dibû. Mirov ketîbûn nav avê, dikirin şepeşep, dikirin qîjaqîş. Bi çokan, bi şivan û bi bêran di bin zinaran de, di bin kevzan de û di bin pelan de beq derdixistin, dest û piyên wan tê xwîne de mabûn. Hîro tirs li cem van tunebû, xwîn ketîbû çavên van. Û hinan jî bi dest û piyên xwe di nav zinaran de beq derdixistin û ew di çengên xwe de diguvaşdin. Xwînen beqan li ser çavên merîyan lêdigelîbûn.

Li peravê çem bi sedan beq bazdidan, her yekî wan bi dereke de direvîyan. Dev li van jev dibû, dikirin helehel, bi qûrqûra wan ewr tevlihev dibû, hîv ketîbû paş ewrekî reş.

Beqek zikgir û heşîn xwe kiribû bin çêre, ji tirsan çav li wê bûn heşt, ew dicirifî û piçeke din şunda sihekî merikî li ser wê xuy kirîbû. Di dest wî de çokê ek hebû. Çok li hewa du se cara babû û paşê mina birûskeke li ser beqa heşîn

ket. Ew li wir bi erdê ve bû yek, çêre xwîn dilop dikir.

Çar mirovên bi dest şiv û dar li hemberî hevdû bûn, li ortê di nav berî van de, beqa çavsor, heşîn û pêçî zer hebû, wan ew hevş kirîbûn, her yekî wan pênc an jî şeş gav ji wê dûr bûn. Ji şiv û darên destên wan de xwîn dadipalî. Li ser piştê beqê beqekeke biçûk hebû, peçiyên wê jî zer bû, wê jî bi çavên xwe yên vedilîstî li derdorên xwe mez dikir. Beqa çavsor du sê caran li der dorên xwe çerx bû lê bi kuda here? Herçar alîyên wê hatîbûn girtin. Piçêke din şun va wê li ser lingên xwe xwe rast kir, ling li wê sist bûn û lê dicirifn, barê wê li wê giran bûbû, wê dikir helehel.

Li hewa vîzevîzên şiv û daran bû, dilopên xwînê li hev diketin. Êdî şevêreş giran giran diket erdê, bi qûrûqûran beqan tarî dihat dirandin. Di bin roniyên estirkan de li jêr leşên beqan û li jor keçelok hebûn.

Beqa çavsor carake din li ser lingên xwe xwe rast kir, ew li ser lingên xwe bû, êdî lingên wê di bin wê de nedicirifn. Barê li ser wê ye biçûk jî xwe rast kirîbû. Minak tu bibêjî herdû beq jî hema hema li bazdanê bûn. Mirovên ku beq hevş kirîbûn gav bi gav xwe nêzikî beqan dikirin. Yekî ji wan bang dikir, dev li wî mina çewalekî jev dibû, wî digot, 'beqa biçûk para min e.' Û vê re jî

herdû beq bi lez bazdan. Bazdan çi ye? We ew bidiyan herdu jî difiriyan.

Beqa biçûk nebû para wî, lê beqa çavsor, heşîn û pîçê zer ketîbû devê wî. Wexta ku beq bazdabû beqa biçûk ser mirovê bangkirî re firiya û li hela din ketîbû nav çêre û ji ber çavan com bûbû. Beqa çavsor jî ketîbû girika mêrik, mêrik pê wê li ser piştê ketîbû erdê, ew heşîn bû, çav li bel bûn û canê wî hişk bû, ew di ci de mirîbûbû. Digotin "mirina wî bi destê beqê bû."

Çem xwîn diherikî. Ji paş çiyên ewrên reş serê xwe bêdeng û bi dizî derdixistin. Mij giran giran xwe li ser çem redixist, her tişt giran giran diket bin perdeyekî gewr û xwe vedişartin. Di nav mijê de bi sedan keçelok difiriyan û li ser leşên beqan dihêwirîn. Ji dûr ve dengê merî cixan gir dihat, "em ji dengê wan êdî xelas bûn". Piçêke din şun va, di nav çêre de dengê "xişexis"ekê dihat û dû re carekê "şep"lî ket ava çem.

Ewr dikir "guregur", brûsk û baran hema hema li hatine bûn. Li ewre ne hîv ne jî estirk hebûn, ewrên reş hevdû dixwarin. Ji mijê bitenê serê çiyên xuy dikir. Piçêke din şun va ji paş çiyên du sê caran brûsk veda, vê re jî erd û ezman dihejîya.

....

Ber nivro bû, beybûnan di nav heşînî de sipî dikir, bi bayê biharê ve giran gi-

ran xwe diheşandin. Serê çiyar berf qet kêr nebû. Li ber malan yêr ku li der dorêr çiyar qet darek nebû. Koçek çûbû, koçek hatibû lê li vir hertişt mîna berê bû. Lê bi tenê li vir dengê beqan û bilûrê kêr bûbû.

Ji dûr ve dengê pez û yêr zengilan dihat. Şivan dîsa li ser kerî boz bûbû, du ve kûçikê kolik bi komek mêş ve dimeşiya, berê wan li çem bû. Pez geştişibû perava çem û xwe bi dev berdan avê. Lê hîn dev û bêvilên wan bi avê nebû, di ci da du sê gav xwe paş ve avitin û li der dorêr xwe mîna dînan çerx dibûn, heta mexelbûnê wan av bi devê xwe nekiribûn û heta ber êvarê jî dikalîn, minak tu bibêjî dergûş digirîyan. Ne kûçikê kolik ne jî kerî boz xwe nêzikî avê çem kiribûn, ne jî şivên dil xwast dest û piyên xwe bi avê çem bişûye.

Şivan pê ve ecêbmabû, hat li peravê çem sekinî, li der dorêr xwe mez kir, çavên wî li zinarî beqa çavsor disekinî ket, wî keserek kûr kişand, zinar kevz girtibû. Çok li şivên sist bûbû, xwe dabû

peravê çem, serê li xwe hejand.

Şivan heta ber êvarê li bilûr dixist, hêstirkên wî li ser rûyê avê çem dilop dikir. Wî digot,

*'beqê beq velîstîye
dilê min de ar vixistîye
carek bazda were cem min
min çavên te ramusîye'*

Ro hema hema diçû avê, lê ne beqa çavsor û pêçî zer hat, ne jî şivên qûreqûrek bihîstibû, êdî wî dest jî bilûrê berda bû. Pez ketibû rê, şivên du sê caran paş xwe ve mez kir, li çem, li çiyar û li malan çav digeland. Wî got, 'êdî tam li vir nemaye, dil û evînê jî malan bar kirîye, mirinê xwe dayîye ber balgehîyan'

Ro çûbû avê, tarî daketibû erdê, ne estirkek ne jî hîv hebû, ewrekî reş ezman girtibû.

Ava çem pêl dida, pêl tevhev dibûn. Di nav şevêreşê de bi hezaran çavên sor li rû avê çem xuyabûn, berê wan ber ve gund bû.



Xizan Şilan bi tembûra xwe ve li ba Amed Tigrîs

Hevpeyvînek bi Xizan Şilan re

Amedekar: Amed Tigrîs

Birêz Xizan Şilan tu dikarî xwe bi xwendevanên Bîrnebûnê bidî nasandin, ka tu kê yê û ji ku yê?

– Belê. Ez di sala 1955an de, li gundê Încovê ji dayîk bûme. Min li gundê xwe heta sinifa çaran xwend û piştê ez çûm, min li Salîhliyê heta orta okulê xwend. Ez ji Salîhliyê ve gerim û me mala xwe bar kir merkeza Qonyayê. Min li wir xwendina xwe dewam kir û lîse qedand. Di wê demê de min hereketa netewî nas kir.

Naskirin û hezkirina te, huner û edebiyata kurdî çawa çê bû? Bi naskirina hereketa kurdî re çêbû?

– Na, min zû dest bi hunerê kir. Min di 14 saliya xwe de dest bi saz û stranan kir. Min xwe bi xwe hînî sazê kir. Min him dinivîsand û him jî distira. Ez wê demê beşdarî nav komên stranbêjan bûm ku ji wan re digotin "aşiqên gelêrî." Min navê xwe yê "Xizan" jî ji wir girt. Em çend kes kom dibûn, me stran diavêtin ser hev û berhev.

Lê mixabin wê demê me bi tirkî dinivîsî û distira. Lê dîsa jî min guhdariya stranên kurdî dikir. Li cem min stranên Mehemed, Arîf, Garebête Xaço, Meryemxan, Ayşe Şan, Mûrado û gelek dengbêjin din hebûn.

Yanî tu ji biçûktiya xwe ve şair î?

– Belê, ez ji du mijaran pir hez dikim û bala min li ser wan e: *helbest û felsefe*. Li Qonyayê min di şeva xwe ya yekemîn de strana ”*Xwedê tu ji qulê xwe fedî nakî*” got. Polîs li min da û pozê min şikand. Ez mehekê li nexweşxanê mam. Salekê piştî faşîstan şeş kêr li min xistin, ez ji mirinê zor bela filitim. Piştî ez mecbûr mam û derketim derê welêt. Pêşî ez çûm Almanyayê.

Kengê tu çuyî Almanyayê?

– Ez di sala 1978an de çûm Almanyayê û şeş sal li wir mam. Carek din zivirîm welêt.

Tu li Almanyayê hînî xwendin û nivîsandina kurdî bûyî?

– Rast e. Ez heta neçûm Almanyayê bi tenê dikaribûm bi kurdî deng bikim, lê nikaribûm bi kurdî bixwînim û binivîsînim.

Tu li wir çawa hînî nivîsandin û xwendina kurdî bûyî?

– Xwe bi xwe. Min berhevoka kovara Hawarê bi dest xist. Tam çar caran xitim kir. Tiştên ku min fêhm nedikirin, min ji hevalên zane dipirsî. Ez bi alikariya Hawarê hînî xwendin û nivîsandina kurdî bûm û min dest pê kir vê care stranên kurdî çêkir.

Ango te li Almanyayê kurdiya xwe li pêş xist?

– Ez li Almanyayê hînê xwendin û nivîsandina kurdî bûm, lê min kurdiya xwe li Swêdê bi pêş xist.

Belê tu kengê hatî Swêdê?

– Ez di sala 1987an de hatim Swêdê.

Tu li Swêdê çuyî kursên kurdî, te çawa kurdiya xwe bi pêş xist?

– Rast e, li Swêdê îmkânên kursên kurdî hebûn û hene, lê ez qet neçûm kursê. Min gramerên kurdî, pirtûkên kurdî pir xwendin. Helbestên kurdî nivîsand. Hinek hevalan helbestên min redakte dikirin, ez li ser kêmasiyên xwe bi baldarî dawestiyam. Ez zû tiştan fêr dibim. Ez di bin bandora gelek nivîskar û helbestvanan de mam û niha jî bi baldarî yek bi yek dişopînim. Tu dizanî di mala min de dibistaneke mezin û girîng heye.

Çawa, li mala te dibistan heye?

– Belê. Dibistana min a herî mezin înternet e. Ez di înternetê de gelek malperan dişopînim. Helbest û pexşanên gelek kesan dixwînim. Heta di înternetê de rastnivîsa kurdî hîn dibim. Têde ferhengên kurdî jî hene ku alikariya mirov dikin. Ma di înternetê de çi tune!

Mirov dema helbestên te dixwîne, dibîne ku kurdiya te ne bi devoka kurdên Anatoliyê ye û kurdiyêke edebî û nêzîkî ya standard e? Tu jî wek hinek nivîskarên Bîrnebûnê çima bi devoka gundê xwe nanivîsîni?

– Ez helbestên xwe bi zimanê nivîskî dinivîsim, ne bi devoka xwe. Di her zimanî de gelek devok hene û zimanekî wan ê nivîskî heye. Zimanê nivîskî yê netewî ye. Divê yê me jî wek xelkê be. Ji derî berhemên lokalî ez bi zimanê nivîskî dinivîsim.

Yanî tu dibêjî divê mirov bi zimanê nivîskiyê hevbeş binivîse?

– Erê.

Heta niha çend pirtûkên te derketine?



Xizan Şilan

– Sê pirtûkên min çap bûne: Xem û xeyal,
Acıların sokağı û Nameyek ji rinda min re.
Yek jî li ber çapê ye. Navê wê Pejnên laşê
mirî ye.

Tu ji bo kovara Bîrnebûnê dikarî çi bêjî?

– Bîrnebûn ji bo kurdan, bi taybetî ji bo
kurdên me yên Anatoliya Navîn gelek
hêja ye. Divê em xwedî lê derbikevin. Jê
re binivîsinin, bixwînin, bikin, belav
bikin. Ji bo hebûna me zimanê me pêwîst
e. Xwendin... xwendin û dîsa xwendin.

*Ji bo van agahdarî û dîtînen te, gelek spas
dikim.*

– Esas ez spas dikim.

*Di dawî de tu dikarî bi tembûra xwe
starneke bistirî?*

– Ser çavan!

WERIN JI MIN BIPIRSIN

keser û nalîna
li ser dilê çemê qeşagirtî
hêrsa pêlên bahoza
hinavên dîn û har
xemgîniya ronahiya finda lertzok
malwêraniya kevokên perşikestî
jiyana li nav tirs û gumanê
werin ji min bipirsin

di gola nermebaranê de
lêvên ziwa û qelişî
li hingura çolistanan
nêçîra henasa masiyan
kemîna îxaneta rûreşîya hovane
jiyana gerdûna nependî
ken û şadiya
li ber bayê dilreşîya zaliman
têkçûyî
werin ji min bipirsin

xweşpeyvînen meyxaneyan
piyala weya destê serxweşan
lezeta sifreya
êvarên belengezan
xewn û xeyalên
di bin lihêfa axînan de riziwayî
werin ji min bipirsin

êşa giyanê şev û rojên kambax
hêvî û hesreta
li xerîbiyê derbederbûyî
awaza bilbilê dernixûn fetisî
şopa birîna bîranînên
mişextbûyî
werin ji min bipirsin

rêwiyan
di pêlên okyanûsan de bi cihhiştî
qêrîn û giriyê parsekên
li kolanên bêxwedî
dengê lorîna dayikên
kezebşewitî
kul û kedera
herika rûbarên westiyayî
gewriya mindalên
li ser sîngê gora Helepçe
xwîn verişiyayî
werin ji min bipirsin

lerizîna dilê
ji tirs û xofan dagirtî
laşê di tora bêbextiyê de
diperpîte
sira xewna şevên herimî
stûxwariya gulberfîna zeviyê bej
keda kefa destên qusandî
bêhna qurnefilên azadiya
ji nalîna keç û xortên şervan
difûre
werin ji min bipirsin

bi paş de zivirîna çerxa
feleka xopan
tîra awirên tûj
ya dilbera lêvsor
şanika
li gerdana rindê
rengê qaşa gustîlzêra
tiliyên yara rûken
seyrana
li ber deriyê bihara bejna esmerê
gulî û biskên bûka
bi morî û mircanan xemilî
werin ji min bipirsin

û min jî
ji giyanê mirî
û hestên bedenê zindî
ji girtîxana derûniya min
ji xilmaşkiya qalpaxên
çavan
ji salnameya çîrokên dapîran
ji talana demên dîrokê
ji asoya deryayên balûpal
û ji tofana keştiya
Nûh
min bipirsin

Xizan Şilan

2008-03-13

SİTRAN

Bêje delalê
Sitranekê bêje
Îşev dîsa
Dil bi kovan im
Serê min de jan û êş e
Tu sitranekê bêje
Ji xemgînîya dilan re
Bi dengekî zîz

Min bigerîne di şevên tarî de
Dibe ku
Xem û xeyalên min
Bînî ziman
Kulên dil bikewînî
Bi wan sitranan
Li şevên bê stêrk
Jê re bibî derman

Kî dizane belkî
Sitrana te rake ser linga
Wan derd û kulan
Bide serhev
Bike xerman.

Mem Xelîkan

XELIKA

"xelika êdî ne dunê ye"

xelika qedere te ye
çimkî
te û kal û pîrên te
xwe bi axa xelika pêçan
bîhna axa xelika keta nav canî we
û we guh da ser hêkatên xelika

li wir tilîyên te
li kevîran ketin
û xwîna te
erd avda
û gulên gul vekirin

te
li xelika heval û yar nas kirin
û
ji wanan gotinên xwaş û qutsî bihîstin
li wir
devê te li tamên biharê ket
li
xelika seatê wextê xwe ji bîr dikir
te
li xelika janên neheqîyê tam kir

dûnê li cîhekî danawestî
xelika wek xelika kabûl bike

ne kêr
ne zêda
rexnên xwe bike
ji dewlemendîyên dûnê tam ke
însanên welatên din nas bike
çavên xwe bi gerê qelew bike

bîr meke
dunê ne weqasî ku em dizanin fireh e
terî ku here
dema ku nefesa te teng bû
vegere xelika

ancax xelika te
bê zehmet qabûl bike
xelika bextê te ye.

